Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1345 25-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Qelenê Rojava ne erzan e’



Bişra Yusif



Hesen Hermêsî



Sozdar Silo



Viyan Egîd/Qamişlo

**Şêneyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku her dem dirûşmeya wan ‘Heta serkeftinê berxwedan’ e û gotin: “Qelenê Rojava ne erzan e, îro siyaseta li ser Kurdan tê kirin siyaseta qirkirinê ye. Ji bo wê divê gelê Kurd bi yek dil û yek ruh li qadan bin. Bi her rengî helwesta xwe nîşan bidin. ”**

Piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk û çeteyên HTŞ’ê qaşo li hev kirin ku di hîn deveran de lihevkirin pêk bê, çeteyên HTŞ’ê hemû hevpeyman binpê kirin û dest bi êrişeke dagirkeriyê ya berfireh a li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Çeteyên ku di gelek eniyan de û bi riya şaneyên xwe yên razayî êrişên dijwar pêk anîn, rastî bersivên tund ên şervanên QSD’ê hatin. Her wiha gel jî li kêleka şervanên xwe parastina bajar, gund û taxên xwe dikin. Di vê çarçoveyê de şêneyên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.

### ‘Em dibêjin ku wê hebûn û tunebûna me jî li ser vê axê be‘

Bişre Yusif diyar kir ku ew ê heya dawî parastina xaka xwe bikin: “Li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişeke pir mezin heye ku ji aliyê çeteyên HTŞ’ê û dewleta Tirk ve pêk tên. Komên çete ji bilî şerê çekdarî, şereke mezin li ser medyayên civakî û di heman demê de yê dronî jî didin meşandin. Ji bo vê jî pêşketinên ku li ser erdê tên jiyîn diyar dikin ku em anha bi taybetî di nava şerê hebûn û tunebûnê de ne. Weke Kurd ger hewldanên tunekirinê li ser me werin meşandin, em dibêjin ku wê hebûn û tunebûna me jî li ser vê axê be. ji ber vê yekê em ê ji bo rûmet, ax û welatê xwe li ber xwe bidin. Çawa ku em ji aştiyê û diyalogê re vekirî ne, di heman demê de em ji bo xweparastinê jî amede ne. Me dît sûcên mezin li dijî mirovên sivîl hatin kirin lê cîhan bêdeng ma. Bi wê yekê tişta ku jê re dibêjin mafên mirovan, bi temamî bêwate bû. Tevî ku zarok, jin û extiyar li pêş çavên cîhanê hatin kuştin jî tu bertek nehat nîşandan. Lewra em wek gelê Rojava baweiya me bi tu hêzî nema ye, ji zarokên me heya dayik û bavan, wê parastin tişta herî girîng di jiyana xwe de bihêlin û pêkbînin.”

### ‘Gelê Kurd tu carî serî na tewînin’

Di heman çarçoveyê de Hesen Hermêsî da zanîn ku ev sedsala dewletên dagirker dixwazin gelê Kurd ji kokê bidin tune kirin û wiha pê de çû: “Her çiqas dewletên hegemon xwestin gelê Kurd qirbikin, lê nikarîn, roj roj kurd zindîtir bûn. Ji ber vê yekê çiqas êriş û gef jî li ser me werin em tu carî serî na tewînin. Bila her kes bizanibe ku ji zarok heya kalên me niha parastina xwe dikin û wê bibin bersiv ji her êrişekî.”

### ‘An jiyana bi rûmet, an jî heta serkeftinê berxwedan’

Hermêsî di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Doz yek e, çarenûs yek e. Piştî ewqas fedakariyan, tu kes dest ji mafên xwe bernade. Li herêmê tevî hemû provakasyonan jî, Kurd, Ereb, Suryan û Xirîstiyan bi hev re ne. heta ku gef û êriş hebin wê nobedarî û tevgera gel bidome. Gel bi girêdana xwîna şehîdan û mîrasa berxwedanê wê heta dawî riya xwe bidomîne. Wê her dem dirûşma ‘An jiyana bi rûmet, an jî heta serkeftinê berxwedan’ ji hemû qadan bilind bibe. ’Em parastina bajar û axa xwe dikin. Me beriya niha çawa çeteyên DAÎŞ’ê têk birin, em ê dîsa wan têk bibin. Niha dîsa berxwedanî heye, em ê jî xwedî li wê berxwedaniyê derkevin.”

### ‘Yan mirin yan jiyaneke bi rûmet’

Di heman çarçoveyê de Sozdar Silo tekez kir ku wê serkeftin ya gelê Kurd be û wiha domand: “di 19`ê çileya 2026`an de, ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD`ê ve seferberî hat ragihandin, di heman demê de banga parastinê hat kirin. Ji ber vê yekê li tevahî gelê Rojava xwe bi çek û rext kiriye, kolan, bajar û gundên xwe diparêzin, îro her kes parastin bingeha jiyana xwe dibîne, da ku xwe ji van çeteyên hov bi parêzin. Em ê heya dawî li ber xwe bidin. Ev 14`e sale em di nava şer û pevçûnan de ne, me bi hezaran şehîd da. Ji bwe vê yekê bila dijminên hov tenê xeyal bike ku bikeve Rojava de. Îro me rojava bi xwîna xuşik û birayê xwe bi serxistiye û qelenê Rojava ne erza ne. Yan mirin yan jiyaneke bi rûmet. Siyaseta îro li ser Kurdan tê kirin siyaseta qirkirinê ye. Ji bo wê divê gelê Kurd bi yek dil û yek ruh li qadan bin. Bi her rengî helwesta xwe nîşan bide ”

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER CAMÊRÎ NECAMÊRÎ Û MERDBÛNÊ**

**Agirê wî venamire:**
- Pir merd e; her tim mêvanên wî hene.

**Berbiçav e:**
- Camêr e; merd e.

**Bila gur mirov bixwin, ne rûvî:**
- Bila mirov ji destê camêran zererê bibîne, ne ji destê kesên beredayî

**Çavvekirî ye:**
- Camêr e; merd e.

**Çavfireh e:**
- Bi heman wateyê.

**Çavtêr e:**
- Merd e; camêr e; çavê wî ne li malê pir e; bi rewşa xwe dilxweş e.

**Deriyê wî vekirî ye:**
- Her dem ji bo mêvanan amade ye; mirovekî merd e; camêr e.

**Derî li ser piştê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Destê xwe jê re vekir:**
- Camêrî pê re kir; merdîtî pê re kir; tişta jê xwestî dayê.

Destvekirî ye:/destê wî vekirî ye
- Merd e; camêr e.

**Duduyan daye tayê xav neqetiyaye:**
- Yekî dev yê din ve berdaye; yekî camêrî kiriye; yekî nexwestiye pirsgirêk mezin bibe.

Du kesan da benikê xav neqetiya.
- Ew nebaşiyê dike tu weke wî neke; tu camêriyê bike.

**Ga û dendik li cem yek in:**
- Mirovekî pir merd e; camêr e.

**Gayek û hêkek li cem yek in:**
- Bi heman wateyê.

**Gepa devê wî di devê xelkê de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Hesp û qesp li cem yek in:**
- Camêr e; merd e.

**Li ber çav e:**
- Bi heman wateyê.

**Ji her ewrî baran nayê:**
- Her kes nikare camêriyê bike.

**Li xwe kêm nekir:**
- Camêrî kir; nexwest ji yên din kêmtir bide, yan bike.

**Mala wî vekirî ye:**
- Mêvandar e.

**Mêvan mêvanê Xwedê ye:**
- Dema yek ji xwediyê malê dipirse, dibêje, hûn mêvanan xwedî dikin, xwediyê malê wisa dibêje.

**Nanek û gayek li cem weke hev in:**
- Camêr e; merd e.

**Nanê wî tê xwarin:**
- Mêvandar e; mala wî vekirî ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi kamîreya ronahî



---

## Jin li Reqayê; Salên DAIŞ’ê, Rizgarkirin, Rêveberiya Xweser û pêvajoya dawiyê



Jina ku di zihniyeta dewlet û malbatê ya zayendperest de hatibû rû bi rûyê hev, di serdemeke ji serdemên dîrokê bû weke hebûneke ne diyar; Ew jî serdema DAIŞ bû...**R-2**

## ‘Pêwîst e di serî de azadiya Rêber Apo pêk were’



Parêzer Ciwan Îso diyar kir ku pêwîst e azadiya Rêber Apo di xetên herî pêş de be. Rêbertî ji bo aramiya civakî û siberojeke demokratîk dixebite lê dewleta Tirk ji bo azadiya Rêbertî û hemû girtiyên siyasî guhertinan pêknayîne û got, “Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, demokratîkbûna Tirkiyê bi xwe ye.”**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1345 25-Çile-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## ‘Rojava ji bo çar parçeyên Kurdistanê xeta sor e’



Hevseroka KCDK- E’ Zubeyde Zumrut da zanîn ku dewleta Tirk sîstema Rêveberiya Xweser qebûl nake û wiha got: “Hêzên desthilatdar pergala Netewa Demokratîk û destkeftiyên Şoreşa Rojava wekî gef li ser desthilatdariya xwe dibînin û hewil didin wê têkbibin."**R-5**

# ‘XWEDÎDERKETINA LI ROJAVA PARASTINA RÛMETA MIROVAHIYÊ YE’

Berdevka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Sema Begdaş diyar kir ku êrişa li ser Rojava pilaneke navdewletî ya qirker e û pêvajoya berî sedsalî ya hêzên hegemon îro tê jiyankirin. Lê gelê Kurd tu carî teslîmiyet qebûl nekiriye û herdem berxwedanî hilbijartiye .Li hemberî êrişên ser Rojava niha tevahiya gelê Kurd seferber bûye û rabûye ser piyan, herwiha xwedîderketina gelê Kurd li Rojava hêzê dide gel û şervanan, di heman demê de rûmeta mirovahiyê diparêze.**R-6**



## Piştgiriya rewşenbîriya Kurdistanî ji bo berxwedaniya Rojava gihiştiye lûtkeyê



Li dijî van pilanên qirkirinê yên ku ji hêla çeteyên hikumeta HTŞ'ê û dewleta Tirk ve li ser gelê Kurd tên meşandin, gelek rewşenbîr, nivîskar, oldar û hunermendên Kurd li seranserî Kurdistan û diyaspora piştgiriya xwe raber dikin.**R-9**



**Ew ne tenê keziyeke ew afsane û destaneke hûnandî ye**
Beritan Xalid R-2



**Dema Ku Welatek Di Çarçoveya Teng A Navendî De Were Nirxandin, Encam Şer û Îxanet e**
Idrîs Henan R-4



**Hêrsa gelê Kurdistanê bilind bûye!**
Ahmet Aktaş R-6

## ‘Bêdengiya cîhanê felaketa mirovî mezin dike’

Koçberên Efrînê diyar kirin ku bi hezaran malbat ji nişkave rastî koçberiyê hatin û wiha gotin: “Di şertên hewaya pir sar, zarok, jin, kesên temen mezin û nexweş ketin rêya koçberiyê, mal û xak li pey xwe hiştin. Em banga li civaka naveneteweyî, rêxistin û saziyên mafên mirovan dikin ku bêdengiya xwe bişkînin."**R-3**



## Şîfreya jiyana azad mirov bi xwe ye

Di dîrokê de her tim lêgerîna mirov a heqîqetê, têkoşîna afirandina jiyana azad e. Di gerdûnê de azadî weke meylekê xwezaya mirov de heye, zindîbûna di mirov de li xwezayê bi xwe heye. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku xwezaya mirov, parçeyek dinyayê û xwezaya zindî ye. Naxwe destpêkê pêwîst e nîzama xebitîna mejiyê mirov were nasîn. Ango mirov dikare bêje ku her mejî cîhanek e. Ji Lewra zîhniyet û awayê fikrê yên mirov bi giştî xwedî xisleteke dualî ne. Ev jî bi fikra atfî (hestiyarî) û fikra analîtîk (tehlîlî) pêk tê.**R-10**

# Jin li Reqayê; Salên DAIŞ'ê, Rizgarkirin, Rêveberiya Xweser û pêvajoya dawiyê

**Esma Mistefa**

Jina ku di zihniyeta dewlet û malbatê ya zayendperest de hatibû rûbirûyê hev, di serdemeke ji serdemên dîrokê bû weke hebûneke ne diyar; Ew jî serdema DAIŞ bû. Li hember wê hêza ku weke tunekar û tufana li ser îdeolojî û hebûna wan; Ew jî tofana YPJ û QSD'ê bû. Di vê raporê de em ê bi taybet rewşa jina Ereb li Reqayê ku di gelek pêvajoyan re derbas bû, bigrin dest.

**Reqa bajarekî çawa ye?**

Parêzgeha Reqa li bakurê Sûriyeyê ye, li ser qeraxa rojhilatê Çemê Firatê, bi qasî 160 km durî rojhilatê bajarê Helebê ye. Bajarê Reqayê gelek şûnwarên kevnar dihewîne ku dîroka wan vedigere serdem û şaristaniyên cuda yên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hebûn. Sê kîlometre li bakurê yek ji deriyên Reqayê, ku Deriyê Bexdayê ye, bermahiyên sê qesrên arkeolojîk ên girîng hatin keşifkirin. Her wiha ji girîngtirîn şûnwaran Keleha Cebar û Qesir El benat in. Rûbara wê 19 hezar û 600 km2 û bi qasî milyonek kes lê dijîn. Her wiha bajarê Reqayê xwedî cihekî strajetîk e ku di aboriya Sûriyê de rolekî girêng dilîst.

**Bi destpêkirina kirîza Sûriyê re li Reqa çi qewimî?**

Bi destpêkirina kirîza Sûriyê di sala 2011'an re, hejmareke zêde ji gelên Sûriyê da ku xwe ji şer û dewletê rizgar bikin, koçberî bajarê Reqayê bûn û piştre bû keleha sereke ya çeteyên ku navê opozisyênê li xwe dikirin. Bi rêya wan, çeteyên DAIŞ'ê derbasî nav bajarê Reqayê bûn. Di sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê bajar bi tevahî dagir kirin. Di wan 4 salan de ku beriya ku sala 2017'an de bê rizgarkirin, Reqa bû parêzgeh û peytexta DAIŞ'ê ku hemû çete û cîhatîstên ji hemû welatên cîhanê xwe tê de birêxistin kirin û weke bajarê xwe ragihandibûn.

**Jin di Reqayê de**

Di nirxandina rewşa jinan di serdema DAIŞ'ê de dibe ku em nikaribin di hemû aliyan ve bigrin dest û heqê wê bidinê, lê belê em dikarin weke cihê kuştina rih û bedena jinê pênase bikin. Di wan 4 salan de gelek jin ji aliyê hişmendiya DAIŞ'ê ve dihatin perwedekirin û bikaranîn. hinek ji wan di aliyê leşkerî de dihatin bikaranîn û hinek jî di aliyê weke ku bibe jina DAIŞ'iyekî dihate bikaranîn. Hele hele çi bi serê jinên Şengalê kirin..
Di wan salên ku Reqa di bin serweriya DAIŞ'ê de bû, Reqa bi zihniyet û qilifê DAIŞ'ê hate sazûmankirin. Hemû mêr di civakê de weke leşker û cîhadîst dihatin perwerdekirin, Jin di civakê de nîn e, hebe jî di zîndanên jinan yên DAIŞ'ê de kar dikirin, ji derveyî wê tu hebûna jin di nava civak û jiyanê de nîn bû. Zaroka 4 salî nedibû ku bi cilên xwe yên zarokan derketiba kolanan, divê ji jor ve heyanî jêr bi rengê reş bê pêçandan. Helbet Cilên jinên DAIŞ'ê jî nedişibûn cilên her jineke misilman. Ew bi terîqteke xwe ya taybet ji xwe re cil çêkiribûn ku ger em bala xwe bidinê heyanî niha jî hinek jin hene wan cilan li xwe dikin. Di reqayê de Katîba Xensai hebû ev ketîbe ango yekîne, yekêneya jinan bû yan jî celadê jinan bû. Jinên ku rêvebertiya wê ketîbeyê dikirin, hemû jin û keçên ku derveyî xeta DAIŞ'ê û fikra Îslama wan ya tund diketin, yekser digirtin bi wan girtinan re yan tu diçû zîndanê yan jî tu dibû cariyeke gel serkirdeyekî DAIŞ'ê. Pirî caran jinên ku dihatin girtin hêvê dikirin ku di zîndanê de jiyana xwe fena bikin û nekevin bin destê wan DAIŞ'iyan.

**Mêr hatin serjêkirin, jin û zarok hatin firotin… Ji Şengalê heya Reqayê**

Di 3'yê Tebaxa 2014'an de DAIŞ'ê êrişê Êzidiyan kir DAIŞ'ê bi hezaran jinên êzidî revandibûn, Fermanên ku bi serê wan de hatine kêliyekê jî ji bîra wan naçe. Gorên komî yên li ber çavên civaka Êzidî dihatin çêkirin, agir bi dilê wan dixin. Li gorî qeydên fermî 81 gorên komî hene. Dibe ku hejmar ji viya zêdetir be jî. Welhasil; DAIŞ dema ku xwe di Reqayê de bicih kir, hemû gelê Êzidî ji jin, mêr û zarokên ku hatibûn girtin bi xwe re anîn wê derê û li meydana Reqayê yê piştre bû Qada Azadiyê mêr hatin serjêkirin, jin û zarok jî di bazaran de hatin firotin. Ev bûyer wê her bimîne lekeyek di bîrwariya dîrokê de ku li ser jenosayda Êzidiyan tu dewlet û rêxistinên cîhanê dengê xwe nekirin. Li ser jinên Êzidî siyaseteke hîn qirêjtir dan meşandin, digotin qetilkirina wan, şewitandina wan û tecawîzkirina wan helal e. Bi vê yekê her jineke Êzidî bi deh caran hate firotin û kirîn, ji xwe re bikar dianîn û di malê de weke xizmetkar bikar dianîn. Em dizanin ku tiştа em tînin ziman bi êş in, lê ev rastiya zihniyeta wan yê li hember hemû pêkhate, ziman û baweriyan e, bi taybet li hember jina Kurd. Ev rastityên ku nayên jibîrkirin ger sedsal jî li ser re derbas bibe ye.

**Avakirina tirsê û xwevekişndina hêzên cîhanî ji wan**

Di wî bajarî de ku bajarê Tepqa jî jê ne gelek dur e û Dêr Zorê xetekî cîhadîst û DAIŞ'ê hatibû avakirin. Ew rewş çar salan dom kir rêxistinbûna xwe tê de xurt kirin û hêza xwe ji wehşiyeta ku bi rêya ragihandinê û medya dijîtal didan diyarkirin, bidest xistibûn. Bi van rêbazan ku tirs di dilê her kesî de didan avakirin, da ku tekez bikin tu kes nikare wan têk bibe. Avakirina rihkî ji tirsê hêşt ku hemû cîhan xwe ji ber van hovan baş ve bikşîne û bûn terora herî xeternak li ser rûyê herdê. Dewletên cîhan, global, navnetewî



û hemû rêxistinên navnetewî tirs li hember wan jiyan kir. Rûxmê ku em dizanin di avakirina vê terorê de, destê hemû hêzên cîhanê heye, da ku bi vê zihniyetê Rojhilata Navîn bi taybet talan bikin, navê Îslamê xira bikin û şer avabikin e. Lê bi berbelavbûna vê zihniyetê û van kesan re, êdî xeteriya wan li ser ew hêzên ku bi destê wan hatine avakirin çêbû.
Di vir de yekemîn û yekane hêza ku karibû li hember vê rêxistin, teror û zihniyetê şer bike hêzên YPJ-QSD'ê bûn.

**Pêvajoya rizgariyê**

Rizgarkirina Reqayê ne bi tenê li herêmê, di heman demê de di qada navnetewî de jî di şerê berxwedana gelan de pêngaveke mezin bû. Ev pêngava ku hêza jinan YPJ û Yekîtiya Jinên Şengalê YJŞ'ê pêşengî jê re kir, bi rizgarkirina gelê herêmê û jinên Êzidî yên di destê DAIŞ'ê de bi serkeftî bi encam bû.
Hêzên Sûriya Demokratîk QSD û Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê û bi hevkariya Kowalîsyona Navneteweyî di 20'ê Cotmeha 2017'an de rizgarkirina bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê ragihand. Piştî wê yekser xebatên jinûveavakirinê û rêxistinkirinê dest pê kir. Di cîhanê de çawa ku Kobanê terora DAIŞ'ê têk birin di heû cîhanê de careke din terora DAIŞ'ê ya ku xwe di Reqayê de bi hemû hêza xwe birêxistin kirinbû, bi destê QSD'ê û YPJ'ê ji holê hate rakirin ev pêvajo muhra xwe li hemû cîhan û hêzên navnetewî kir ku yekemîn hêza li ber van hovan û zihniyetê bi îdeolojiya avakirina pergaleke demokratîk, aştî û wekheviyê di nava hemû pêkhateyên herêmê de; Ew jî QSD'ê bû.

**Rizgarkirina jin û pêvajoya Rêverberiya Xweser**

Bi hezaran jin ji girtîgeh û di bin destê wan teroran de ji jinên Êzidî bigre heyanî yên Ereb û Kurd, hatin rizgarkirin. Ev yek di dîroka mirovahiyê de weke avakirina jiyaneke nû ji her jin û zarokakî re bû. Di dîmen û wêneyê di dema rizgarkirina van jinan de, bi hawara rizgariyê ber bi hêzên YPJ'ê ve dibeziyan û tililiyên serkeftin û azadiyê li badikirin. Helbet ev yek erka hêzên YPJ'ê ye ku heya niha jî li ser wê bingehê têkoşîna xwe didomîne. Jin, keç û zarokên Êzidî bi hezaran hatin rizgarkirin û ji gola qirkirinê hatin xilaskirin. helbet gelek jin û zarok jî hatin revandin û girtin ku heyanî niha jî di gelek oparasyonan de têne rizgarkirin.
Di destpêkirina rêxistinkirina gel û avakirina saziyên Rêverberiya Xweser re. Xebatê jin jî hate birêxistinkirin êdî sazî û tevgerên xweser ji Kongra Star bigre heyanî cîhgirtina jin di hemû saziyan de. Ev yek bi esasgirtina sîstema hevserokatiyê re, jinên Ereb cihê xwe di hevserokatiya xebatê giştî de goirtin. Her wiha di xebatê perwerdehiyê û ji nû ve pêşxistina jinan li ser bingeha peradîgma Netewa Demokratîk û azadiya jin. Jina Ereb bi taybet ku ev cara yekemîn e di nava pergaleke wiha de dikare jiyan bike de, di cihgirtina di nava saziyên Rêveberiya Xweser de pir çalak û rol girt. Bi hemdemiya zihniyeta dewlet, pavksalar û zayenperest re; jina Ereb têkoşîna navxweyî ya guhertina zihniyet û xwe îsbatkirinê li ser du aliyan meşand. Êdî di hemû sazî, rêxistin û destgehên Rêveberiya Xweser û xebatên xweser de jina Ereb li kêlek jina Kurd û hemû pêkhateyên din rol û hebûna xwe ya sereke hebû. Ev yek heyanî sala 2026'an dom kir.

**Guhertina serdema azadiya jin ber bi vegera serdema tarîtiyê ve**

Bi guhertina dengeyên siyasî û geşedanên ku piştî hatina hikumeta demkî ya Sûriyê re qewimîne, piştî şer û berxwedaniya ku li her du tayxên Kurdan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatiye kirin. Hikumeta demkî bi serpereştiya komên çekdar yên berbelav pêk tê, berê xwe da herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Komên çekdar bi binpêkirina hemû lihevkirinan re di 16'ê Çile de Reqa hate hedefgitin. Di encam de hêzên QSD'ê piştî rêkeftinan paş ve hatin û Reqa weke bajarê rizgarkirî ji aliyê komên çeteyan ve hate ragihandin. Jin careke din ketin serdema DAIŞ û zihniyeta tarîtiyê. Ya balkêş ku ev jin bi dilxweşî vê carê ev yek qebûl kirin!! Gelo piştî wê jina ku nedikarî peyva siyasetê bîne ser ziman, bû siyasetmedar. Jina ku tu nêrîna wê di civak û sîstemê de nîn bû, bû hevserok û cihê biryarderxistinê. Jina ku sporr nedizanî çi ye bû hekem... Gelo wê vegere rewşeke çawa?

## Ji Ramanên Jin



### Ew ne tenê keziyeke ew afsane û destaneke hûnandî ye

**Bêrîtan Xalid**

Jinên azad tekez kirin ku keziyên jinên kurd wê her hûnandî bimînin weke sondekê û azad weke welatekî , her kesê ku hewl bide keziyekî qutke wê rastî zayîneke nû ya jinên berxwedêr were, ev jî bersiva hemû jinaye piştî qutkirina keziyê şervaneke YPJ'ê li Reqayê ye .Di dîmenekî gelekî bi êş ku hat belavkirin tê de çeteyek girêdayî Hikûmeta Şamê ku gelekî ji xwe razî ye rahiştiye keziyê şervanekê piştî ku ew şehîd xistiye , vê yekê jî li pêşiya kamîreyê dike , ew dîmen ne tenê dîmenekî hov bû ew peyamek bû ku dixwest bighîne hemû jinan ku îro bi vî şêwazê qirêj dixwazin jinan bê rûmet bikin .Lîstina bi cenazeyan û qutkirina porên wan ew jî yek ji rêbazên tundiyê yê li dijî jina ye , dixwazin bi vê kevneşopiyên jinên kurd ji holê rakin , ji ber di nêrîna wan de ew e ku şer bi mirina mirovan xilas nabe .
Di Hêrêmekê weke herêma Cizîrê de li cem kurd û ereban di gelek deman de hûnandina keziyan di demên êşa mezin de weke windakirina mirovekî nêzîk ve , carnan jî jinên bi temenê xwe mezin di windakirina xizmekî xwe yê nêzîk de kezîyê xwe qut dikin , weke wate tê ku ew kezî tişta herî bi nirxe li gel jinê ye loma dike weke diyarî , ev jî jinên xwedî îradeyeke azad dikin , loma li gel kurdan qutkirina keziyan tê wateya destavêtina li rûmetê ye .
Ev kirin ne tenê destavêtina ji keziyê şervanekê ye , ev tê wateya destavêtina li pîroziyên li gel hemû malbat û eşîra ye , tê wateya derbaskirina xetên sore bê çawa li dijî civakan vê dikin û ev dijminatiye . Kezî ew keziyên kurdan e , hûnandiye bi bingehên kurdan , girêdayî ye bi welatekî bi êş ku xwîn rijandiye , ev sûc dihêle ku weke sûcekî dijî sembol û mirovahiyê bê kirin . Di wijdana kurdan de ev ne tenê xemilandine , lê ev somboleke ku koka xwe ji dîroka civakî û ruhî tîne , girêdayî hêza jinên kurd û cesareta wan e , bi wata ku jin şirîke di tekoşîn û parastina ax û nasnameyê de .Di çanda ereban de jî , porê jinan weke girêdana bi bingehên namûs û rûmetê ve ye , dibînin ku ew por beşeke ji rûmeta malbatê tevahî ye ne tenê milkê wê jinê ye . Lewma qutkirina por li cem eşîran weke sûcekî mezin tê dîtin ji ber gelek wateyên xwe heye . Ji ber vê qutkirina keziya şervanekê li cem kurd û ereban nehat qebûl kirin û gotin we keziyek qut kir û bi milyonan kezî bên hûnandin .
Li vir mirov nikare li vê bûyerê weke bûyereke ji rêzê binere, ev dikeve rêze sûcên ku bi salan li dijî jinên kurd tê kirin , ji ber vê hemû jinan dest bi kampanya hûnandina keziyan kirin û li hemû welatan jinan piştgiriya xwe bi jinên kurd re nîşan dan û peyamên gelekî bi hêrs dan .Mirov li vir dikare bêje ristika porê ku dikaribû tenê wekî beşek ji laş were dîtin، bû beşeke berxwedanê û pira ku navbera kes û civakê girê dide، û peyamek komî û bihêz e ku dibêje: tiştên ku bi zorê têne standin an jî têne binpêkirin، tu carî ji bîr û nasnameyê nayên rakirin. Ristik bû dirêjahiya dîrokê، neynika çandê û şahidiya xweşberdanê، û sembola nifşekê ku li dijî zulmê ser neketinê qebûl nake. Bi vê kirina sembolîk re، jinan laş، rûmet û bîranîn dîsa bi awayek nû wate kirin.



# Neteweyên Yekbûyî

**Navenda Nûçeyan**



Neteweyên Yekbûyî an Neteweyên Yekgirtî (NY), rêxistina navneteweyî ya herî mezin û naskirî ya cîhanê ye. Navenda wê ya sereke li New Yorkê ye û ofîsên din ên sereke li bajarên wekî Jenev, Nairobî, Viyana û Den Haag hene. Armanca wê jî parastina aşitî û ewlekariya navneteweyî, pêşxistina têkiliyên dostanenya di navbera gelan de û pêkanîna hevkariya navneteweyî ye.
Neteweyên Yekbûyî piştî Şerê Cîhanê yê Duyem bi armanca pêşîlêgirtina şerên pêşerojê, li cihî Komela Gelan a ku bêbandor bû hate damezrandin. Di 25'ê Nîsana sala 1945'an de 50 kes li bajarê San Franciscoyê ji bo konferansekê li hev civiyan û dest bi amadekirina Peymana Neteweyên Yekbûyî kirin ku di 25'ê Hezîrana sala 1945'an de hat qebûlkirin û di 24ê Cotmeha sala 1945'an de dema ku Neteweyên Yekbûyî dest bi xebatên xwe kir, ket meriyetê. Li gorî Peymannameyê, armancên rêxistinê parastina aştî û ewlehiya navneteweyî, parastina mafên mirovan, gihandina alîkariyên mirovî, pêşvebirina geşedaniya domdar û parastina hiqûqa navneteweyî ye. Di despêka damezrandina saziyê de 51 dewletên endam hebûn. Bi beşdariya Sûdana Başûr di sala 2011an de, endamên rêxistinê gihiştin 193 dewletan ku hema hema hemî dewletên serwer ên li cîhanê ne.

**Dîrok**

Rêxistina navneteweyî ya nû di navbera şandeyên Çarên Mezin ên Hevalbendan de li Konferansa Dumbarton Oaks ji 21'ê îlonê heya 7'ê çiriya pêşîn a sala 1944'an de hate gotûbêj kirin. Di konferansê de di navbera wan de li ser pêşniyarên ji bo armanc, avahî û xebata rêxistina navneteweyî ya nû li hevhatinek pêk hat. Beriya ku hemî pirsgirêk bên çareserkirin, konferansa li Yaltayê, pê re gotûbêjên din ên bi Moskoyê re pêk hatin.
Neteweyên Yekbûyî di sala 1945 de: endamên damezrîner bi şîna vekirî, parastin û herêmên endamên damezrîner bi şîna tarî hatiye diyarkirin.
Di 1'ê Adara 1945an de 21 dewletên din Danezana Neteweyên Yekbûyî îmze kiribûn. Piştî çend mehan Konferansa Neteweyên Yekbûyî ya li ser Rêxistina Navneteweyî li San Francisco, di 25'ê nîsana sala 1945'an de, bi beşdariya 50 endam û hejmarek ji rêxistinên nehikûmî vebûn. Çar welatên mezin ên sponsor welatên din vexwendibûn ku beşdar bibin û serokên şandên her çaran serokatiya civînên giştî kirin. Winston Churchill ji Roosevelt xwest ku piştî rizgarkirina Parîsê di tebaxa sala 1944an de, Fransayê vegerîne statuya hêzeke mezin. Amadekirina Peymana Neteweyên Yekgirtî di nav du mehên pêş de bi dawî bû û di 26ê hezîrana sala 1945'an de ji aliyê nûnerên 50 welatan ve hat îmzekirin. Jan Smuts nivîskarê sereke yê pêşnûmeyê bû. Neteweyên Yekbûyî di 24'ê Cotmeha sala 1945'an de bi erêkirina peymannameyê ji aliyê pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlekariyê-Amerîka, Brîtanya, Fransa, Yekîtiya Sovyetan û Komara Çîn û ji aliyê piraniya welatên din ve û bi piraniya 46 îmzekaran ve, bi awayekî fermî hate damezrandin.
Civînên yekem ên Civata Giştî, bi nûnertiya 51 welatan û Encûmena Ewlekariyê di destpêka çileya sala 1946an de li bajarê Londonê pêk hat. Gotûbêjan bi yekcarî dest pê kir, mijarên aktîv ên wekî hebûna leşkerên Rûsî li Azerbaycana Îranê, hêzên Brîtanya li Yewnanistanê û di nav çend rojan de vetoya yekem hate pêkhatin. Di vî demê de dîplomatê Brîtanî Gladwyn Jebb bi wekalet sekreterê giştî bû.
Civata Giştî bajarê New Yorkê ji bo navenda Neteweyên Yekbûyî hilbijart, avakirin di 14'ê Îlona sala 1948'an de dest pê kir û tesîsa rêxistinê di 9'ê Cotmeha sala 1952'an de qediya. Cihê mîna avahiyên baregehên Neteweyên Yekbûyî yên li bajarên Jenev, Viyana û li bajarê Naiobiyê, wekî erdê navneteweyî hatiye destnîşankirin. Wezîrê Derve yê Norwêcê Trygve Lie wek yekem sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî hatiye hilbijartin.

**Endam**

Ji xeynî Vatîkanê, hemî dewletên serbixwe yên cîhanê yên bê nîqaş endamên Neteweyên Yekbûyî ne. Sûdana Başûr ku di 14ê tîrmeha sala 2011'an de tevlî rêxistinê bû, bi tevayî 193 welatên endamên Neteweyên Yekbûyî, ya herî dawî ye. Peymana Neteweyên Yekbûyî ku qaîdeyên endamtiyê destnîşan dikin ev in:
-Endametiya Neteweyên Yekbûyî ji hemî dewletên din ên aştîxwaz re vekirî ye ku erkên ku di vê şertnameyê de cih digirin qebûl dikin û li gorî biryara rêxistinê, dikarin û dixwazin van erkan bi cih bînin.
-Qebûlkirina her dewletekê ji bo endamtiya Neteweyên Yekbûyî dê bi biryara Lijneya Giştî ya li ser pêşniyara Konseya Ewlekariyê pêk were.
-Her wiha du dewletên çavdêr ên Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî yên ne endam hene. Yek ji van serweriya Vatîkanê ye û yeka din jî Dewleta Filistînê.[11] Giravên Cook û Niue, her du dewletên ku bi Nû Zelenda re di nav hevkariyek azad de ne, endamên tam ên gelek ajansên pispor ên Neteweyên Yekbûyî ne û "kapasîteya wan a bi tevahî peyman kirina" ji aliyê Sekreteriyayê ve hatiye pejirandin.
-Îndonezya yekem û tekane welat e ku endametiya xwe ji Neteweyên Yekbûyî vekişand, ji bo protestokirina hilbijartina Malezyayê wekî endamek ne-daîmî ya Encumena Ewlekariyê di sala 1965an de di dema nakokiyên di navbera her du welatan de pêk hatibû. Piştî ku CONEFO wekî hevrikek demkurt a Neteweyên Yekbûyî hate damezrandin, Îndonezya di sala 1966an de endamtiya xwe ya tam ji nû ve da destpêkirin.

**Civata giştî**

Civata Giştî ji welatên endam ên rêxistinê pêk tên. Nûnerên her endamekî di Lijneya Giştî de nikarin ji 5 kesan zêdetir bin. Karên Lijneya Giştî ev in:
-Di derbarê bêçekkirin û kontrolkirina çekan de pêşniyaran bidin.
-Ji bo danûstandinên ku bandorê li aştî û ewlehiyê bike, di her mijarê de pêşniyaran bikin.
-Ji bo çareseriya aştiyane ya pirsgirêkên ku têkiliyên baş ên di navbera welatan de xera dikin pêşniyaran bikin.

**Konseya ewlekariyê**

Konseya ewlekariyê di qada siyasî de desteyek rêveber e. 5 endamên daîmî yên Konseya ewlekariyê DYA, Çîn, Înglistan, Fransa û Rûsya xwedî mafê vetoyê ne. 10 endamên demkî ji bo heyama du salan têne hilbijartin û her sal 5 endamên demkî têne nûkirin. Endamtiya demkî di 1'ê Çileyê de dest pê dike û di 31'ê Kanûna pêşîn a sala din de bi dawî dibe. Hilbijartina wan li ser hevsengiya erdnîgarî ye. Karên konseya ku ji 15'e endaman pêk tê ev in:
-Li gorî armanc û prensîbên Neteweyên Yekbûyî parastina aştî û ewlehiyê bê parastin.
-Lêkolînkirina her rewşek nakokiyên ku dibe sedema nakokiyek navneteweyî.
-Amadekirina planên kontrolkirina çekan.
Rêya ku divê were şopandin bi lêkolîna ka xetereyek an êrîşa li dijî aştiyê heye pêşniyar dike.
-Li dijî êrîşkaran bi avakirina yekîneyên leşkerî tedbîran bigirin.

Pêvajoya biryaradayina konseya ewlekariyê

Ji bo ku Encumena Ewlekariyê biryarê bide, rêjeya 9/15 pêwîst e û divê yek ji endamên daîmî dengê xwe nede. Li gorî hiqûqa Neteweyên Yekbûyî, dema ku Encumena Ewlekariyê biryarek distîne, yek an jî çend endamên xwedî mafê veto beşdarî dengdanê nebin, nayê wê wateyê ku ev endam biryarê veto dikin. Her wiha bêlayetiya endamên daîmî tê wateya heman encamê.

# Li Swêdê Sosyal Demokratan êrişên li ser Kurdan şermezar kirin

**Navenda Nûçeyan**

**Beriya mîtîngeke ku tê payîn bi deh hezaran kes beşdar bibin, hewldanên dîplomatîk zêde bûn. Partiya sereke ya muxalefetê Sosyal Demokratan daxuyaniyeke nivîskî dan. Partiya Çep jî ji bo mîtînga sibê bang kir.**

Beriya mîtînga mezin a ku tê payîn li paytexta Swêdê Stockholmê roja şemiyê bi deh hezaran kes beşdar bibin, hewldanên dîplomatîk jî zêde bûn.
Yusuf Onal û Menîce Yıidirim ji Navenda Civaka Demokratîk a Kurd ji bo têkiliyan çûn Parlamentoya Swêdê.
Piştî têkiliyên bi Sosyal Demokratan re, hate zanîn ku hin parlamenter dê beşdarî mîtînga li Stockholmê ya roja şemiyê bibin.
Daxuyaniya partiyê ji aliyê Serokê Alîkar ê Komîteya Parastinê ya Parlamentoya Swêdê Morgan Johansson ve hate parvekirin. Daxuyanî wiha ye:
"Em wekî Sosyal Demokratan ji pêşkeftina tundiyê li Sûriyê pir xemgîn in û em êrîşên dawî yên hêzên hikûmeta Sûriyê yên li ser Kurdan û herêmên Kurd şermezar dikin.
Em daxwaza agirbesteke lezgîn dikin. Divê alî vegerin ser maseya muzakereyê û diyaloga siyasî ya li ser pêşeroja Sûriyê ji nû ve bidin destpêkirin.
Em binpêkirinên mafên mirovan şermezar dikin û em daxwaz dikin ku ji kesên berpirsiyar ên li ser îstismarên ku îro li Sûriyê tên kirin hesab bên pirsîn. Divê sûc bên lêpirsînkirin û berpirsiyar radestî edeletê bên kirin.
Hêzên Kurd bi hev re bi Koalisyona Navnetewî re berpirsiyariyeke mezin girtin ser xwe ji bo têkbirina terorîzmê, hewldanên biryardar nîşan dan û fedekariyên mezin kirin. Ev yek nîşan dide ku welatên endamên koalisyonê berpirsiyariyeke taybet heye ku bi awayekî xurt tev bigerin da ku êrîşên îro yên li ser Kurdan rawestînin.
Divê mafên kolektîf û kesane yên komên etnîkî û olî yên Sûriyê bên mîsogerkirin. Pêvajoya piştî dîktatoriya Esed divê hemû aliyan bigire nav xwe.
Komkujiyên li ser Dûrzî û Elewiyan ên dubare, xetereyên heyî eşkere nîşan didin.
Hin beşên desthilatdariya heyî ya Şamê bi tevgerên îslamî yên radîkal ên ku berê wekî terorîst hatine binavkirin ve girêdayî ne. Ev rewş daxwazên misogeriyên demokratîk, parastina kêmneteweyan û çavdêriya navneteweyî hîn zêdetir lezgîn dike.
Sosyal Demokrat daxwaz dikin ku hikûmeta Swêdê ji bo pêşîgirtina li felaketeke mirovî ya nû li Sûriyê hemû kanalên dîplomatîk ên heyî bi kar bîne.
Alîkariya Swêdê ya ji Şamê re û piştgiriya siyasî divê bi daxwazên zelal ên ji bo demokrasiyê, mafên mirovan û parastina kêmneteweyan ve girêdayî be."



# Şîfreya jiyana azad mirov bi xwe ye

Cûdî Cizîr

Di dîrokê de her tim lêgerîna mirov a heqîqetê, têkoşîna afirandina jiyana azad e. Di gerdûnê de azadî weke meylekê xwezaya mirov de heye, zindîbûna di mirov de li xwezayê bi xwe heye. Pêwîst e neyê jibîrkirin ku xwezaya mirov, parçeyek dinyayê û xwezaya zindî ye. Naxwe destpêkê pêwîst e nîzama xebitîna mejiyê mirov were nasîn. Ango mirov dikare bêje ku her mejî cîhanek e. Ji Lewra zîhniyet û awayê fikrê yên mirov bi giştî xwedî xisleteke dualî ne. Ev jî bi fikra atfî (hestiyarî) û fikra analîtîk (tehlîlî) pêk tê. Fikra atfî di kêliyê de ye û şaneya kok bi awayê fikirandina giştî ye. Fikra tehlîlî piştre pêş ketiye û çalak bûye. Fikra atfî zêde tehlîl naxwaze. Yanî mirov dikare bêje ku mirovek vediguhere civakê. Mirov her tim di nav parvekirinekê de ye. Jiyan bi hemû leza xwe berdewam dike. Pîroziya ax, av, hewa, agir û şewqê ji têkiliya xweza û mirov çêdibe. Naxwe şîfreya jiyana azad mirov bi xwe ye. Peyva mirov, peyveke kok çavkanî ye û di çawaniyeke ku îstîqameta her tiştî diyar dike. Ji vê hêlê ve rast pênasekirrina têgîna “mirov” girîng e. Bi qasî pirsa, “Mirov ji ku derê tê diçe ku derê?”, bi pirsên “Mirov çi ye û kî ye?”, “Di gerdûnê de cİh û pozîSyona ferd çi ye?” re jî eleqedar e. Destpêka Pirsgirêka gerdûn, xweza û cîhanê, destpêka pirsgirêka mirov re di nav hev de pêş ketiye. Pirsgirêkên der bara her duyan de bi hev re hatine destgirtin û hizirîn. Her xeyal, tevlî çemê xeyalan dibe. Destek, hezar destî digire. Cew0herê mirov, mirov bi xwe ye.



Divê di serî de mirov bi ruh û mejiyê xwe evîndar bibe. Mînak, di asta evînê de eger mirov ji azadiyê hez neke û lê negerê, lêgerîna azadiyê têr nake. Lêgerîna azadiyê bi mirov re eleqeder e. Rastiya mirov îfade dike. Di nav hemû zindiyan de ya xwe ferq dike û li pey azadiyê dikeve mirov e. Di nav heyînan de tenê mirov bi dîroka xwe ve eleqedar e û ferq dike. Di lêgerîna azadiyê de mirov xwebûn derxistiye holê. Naxwe, Jiyan xwebûn e. Mirov ji destpêka xwe ve di nav vê lêgerînê de ye. Yanî mirov, her tim bi evîna mezin di nav lêgerîna heqîqetê de bûn. Lêgerîna jiyana azad, weke taybetmendiyên xwezaya mirov, bênavber û bêdawî ye. Mirovê yekem gava çavên xwe li jiyanê vekir, li ber xwe da, fikirî û pirsên, “Ez kî me? Ez ji ku derê têm û diçim ku derê? Ez çawa hatim afirandin?” kir. Ji wê rojê heya îro mirov li bersivên van pirsan digerin. Lêgerîn bênavber didome. Civakbûn, hiş û aqlê mirov çiqasî pêşve diçe, lêgerîn û lêpirsîn jî zêde dibin. Mînak Hegel ji fikir derdikeve rê. Dibêje ku ya bingehîn hişmendî ye, mirov tenê mecbûriyeta vê fêm bike û li ser kontrol çêbike dikare azad bibe. Li gor Hegel pêwîstiya azadiyê bi zanebûnê heye. Hebûna mirov û meyla xwesteka azadiyê di nav hev de ye, ji hev nayê qetandin. Mirov li gor xwezaya xwe her tim diguhere, vediguhere, zêde dibe, cuda dibe. Di nav hewldan û lêgerîneke bênavber de ye. Lêgerîn jî ji vê hêlê ve bêdawî ye. Mînak, di lêgerîna azadiyê de mirov her tim li ya herî baş, xweşik û bilind geriyaye. Lêgerîna azadiyê, têkoşîn û lêgerîna afirandina terzê jiyanê ya li gor hêvî û xeyalên mirov e. Afirîna mukemmel ya hişmendî, zîhn û xeyalê mirov e. Mirov ji pêwîstiya şîrovekirina xwezayê hatiye dinyayê. Şîfreya jiyana azad bi mirov re eleqeder e. Rastiya mirov îfade dike. Di nav hemû zindiyan de ya xwe ferq dike û li pey heqîqetê ye mirov e. Ji Lewra di civaka xwezayî de mirov bi heqîqetê re di nav ahengekê de bûn. Kedxwarî, kedxwar û yên keda wan dihat xwarin nebûn. Mirov ji bo civaka azadixwaz, wekhevîxwaz ya wenda kiriye dest bi lêgerînê kir. Mirov di baxçeyê şêrîn ê bihuştê de azad bû. Lê roj hat mirov azadiya di baxçeyê şêrîn ê bihuştê de wenda kir. Piştî wê gera li azadiyê ya heta roja îro didomê. Xweza û mirov hevdu bandor dikin, ji hev bandor dibin û hev merc dikin.

Mirov bi qasî ku civakî dibe xwezayê derbas dike. Azadbûn di wateyekê de derbas kirina xwezayê ye. Sermayedarî îro hemû mirovatî dîl girtiye. Bi hezar û yek zincîran bi xwe ve girê daye. Xela, birçîbûn, bêkarî, kedxwarî, tundî, newekhevî gihiştiye asteke xeternak. Her kes ji cinawir û mexlûqê navê wê dewlet e, zerarê dibîne û di nav êşan de digevize. Her kes dixwaze ji vî cinawîrî rizgar bibe. Lê çawa? Bi kijan rêbazan? Ha tam di vê mijarê de pirsgirêka rêbaz dikeve rojevê. Mirov bêyî rêbaza mîtolojîk red bike, dikare hin rasttir bigihîje koka xwe. Dikare çavkaniyê hîn rasttir tespît bike. Ji ber dîrok li ser raborî, roja îro û siberojê şekil digire.

# Zanista heyî ji civakê re çareseriyê nayne

Asya Weşûkanî

Dema ku qala pirsgirêkên jin û civakê têye kirin yekser, şer, tundî, tengezarî, koçberî, talan, wêran û dagirkerî têye bîra mirov, wiha ji mirov re têye ku civak di nava dojehekê sincirî de jiyan dike û hew dikare tehemûl bike. Weke ku têye zanîn 30 hezar sale ku civaka mirovahî di nava koledariyeke pir kûr de; jiyan dike û pirsgirêk wiha kûr bûne ku weke çiyayan, lêhatine û herî zêde jî zayenda jin û zarok ziyanê dibîne. Ji şer û tundiyê jî herî zêde zarok, jin û kesên bi temen mezin, ziyanê dibînin û ewlekariya jiyana wan dikeve bin metirsiyê de.

Mirov di van demên dawiyê de dibîne ku li şûna bidawîkirina şer û tundiyê berevajî wê şer û tundî li ser, gelan têye ferz kirin. Wiha dixuye ku wê pergala sermayedar bi rengekî gilobal şer li ser dewletên netewî ferz bike û şerên heyî jî; wê bi siyaseta ferzkirinê ya weke ku çawa li ser dewleta Venzulya pêkanîn bike. Li pey vê siyasetê Îngilîz hene, lê serokê Emerîka Tramp ê ku xwe weke dîkê elokan dike derdixîne pêş û hemû kar û bernameyên bi wî didin kirin û wê mirovahiyê di nava şer de wêran bikin.

Hêzên NATO’’her çiqasî hewildan ku dewletên mîna Efganistan, Îraq û Lîbya ji holê rakin, mixabin serneketin û vê carê jî rêbazê xwe guhertin. Rêbazê wan yê nû jî ewe ku bi destê hin dewletan, hin dewletên din ji holê rakin, an jî hêza wan bişkînin û weke Hemas û Hizbullaha Lubnanê li wan bikin. Xwe li ser dewleta Îslamî Îran jî ceribandin; nêzî du hefteyan ew ji hêz xistin û niha jî hewildidin ku bi gefên xwe; dilê wan rawestînin. Lê mixabin Îran jî li hemberî gel, serhişkiyê dike û xwe ji wan re dike hedef.

Her çiqasî tevgera azadî û PJAK’ê hewildidin ku, pergala meleyên zalim a Îranê hişyar bikin û bi rêbazên demokratîk pirsgirêkên kurd û ên netewên din bi pergalê re çareser bikin, lê mixabin Îran serhişkiyê dike û wê dawiya wan jî weke ya beriya wan bin. Ji xwe niha jî hinceta Emerîka heye ku li pergala, Îran a tundrew bide û Îsraîl jî hazire û gefan li Îranê dixwe. Di encam de Emerîka ketiye pey rakirina dewlet netewên wan, ji xwe re kirine weke emîrlikan û hewil didin xwe jî bike dewleta herî mezin, hêz û navendî ji bo ku ji her kesî re meydanê bixwîne û wan li gorî xwe bi rêk û pêk bike.

Lê gereke were zanîn ku her Emerîka û di serî de, Îngilîz çibikin jî wê dawiya wan were û xelasî ji wan re tuneye. Ji ber ku alûziyeke bingehîn jiyan dikin. Pergala sermayedar her tim bi tewriya xwe dida destnîşan kirin ku dawiya dîrokê hatiye. Ji bo ku pergala xwe cîhanî bike û mirovahiyê di nava çerxa feleka xwe de bigerîne û li ser wan serweriya xwe ferz bike. Lê dewlet û dewletokên ku heman hişmendiyê jiyan dikin, bi wan re ketin nava pêşbirkê de û xwe lihevdû rakişandin û kîjan hêz, bi kîjan hêzê dikare wê tekez ewê serkeftî be.

Weke ku tê gotin: Desthilatdarî valatiyê qebûl nake û herwiha, pevçûn û nakokî berdewam dikin û weke ku têye texmîn kirin; wê hevdû weke dînazoran qir bikin û dawiyê li hişmendiya, kujerên kastîk a 30’î hezar salî bînin û herî dawiyê jî ez xeberdana xwe wiha bilêv dikim û dibêjim: Ne dawiya dîrokê dawiya pergala zalim û nûker hatiye û wê kawisa wan hêzên dirinde bi demê re kûr bibe û bi lêdana; dewletên netewî wê alûziya wan dawî lêneyê û wê tekez, ewê xwe bi xwe hevdû tune bikin û wê serkeftin ya jin û civakê be.



# Xwepêşandanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê berfireh dibin

**Xwepêşandan û çalakiyên li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ku 28'ê Kanûna 2025'an hatibûn destpêkirin bênavber dewam dikin. Li gorî raporên hin saziyên mafê mirovan di van xwepêşandanan de heta niha nêzî 4 hezar û 322 xwepêşander hatine kuştin û zêdetirî 5 hezar 811 xwepêşander jî birîndar bûne.**

Navenda Nûçeyan

Ji 28’ê Kanûna 2025’an ve li seranserî Îran û Rojhilatê Kurdistanê li dijî qeyrana aborî, pirsgirêkên siyasî û civakî xwepêşandan destpêkirine. Tevî ku rejîma Îranê bi tûndtirîn şêwaz êrîşê xwepêşandanan dike jî her ku diçe xwepêşandan berfirehtir dibin. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a HRANA’yê, jıo destpêka xwepêşandanan ve 26 hezar û 314 xwepêşander hatine binçavkirin. Her wiha li gorî heman çavkaniyê di encama êrişên hêzên Îranê de 4 hezar û 322 xwepêşander hatine qetilkirin. Ji wan 33 zarokin,Tê gotin ji vê hejmarê 22 kes di bin temenê 18 salî dene. Di heman demê de tê gotin ku heya niha nêzî 5 hezar 811 xwepêşander jî birîndar bûne.



**Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê qutkirina înternet û xetên peywendiyan didome**

Medyaya bi ser rejîma Îranê, bi weşandina dîmenên 132 xwepêşanderan li xwe mikur hat û xwepêşandanan wekî serhildan bi nav kir. Binçavkirin û girtinên rejîmê tenê bi xwepêşanderên li kolanan ve sînordar nemane; bi dehan kes ji bo saziyên ewlekariyê jî hatine vexwendin. Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê qutkirina înternet û xetên peywendiyan didome. Li gel vê yekê jî hêzên rejîmê diavêjin ser malên ku xwedî xetên peywendiyan in.

**Elî Xamaneyî bi rêya medyaya dewletê îtiraf bi kuştina xwepêşanderan kir**

Li bajarên Rojhilatê Kurdistanê gelek hêzên leşkerî hatine bi cihkirin û 24 saetan li kolanan çavdêriyê li ser gel dikin. Di dema xwepêşandanan de çekên cûda û bombeyên gazê bikartînin. Her wiha ji bo diyarkirina mal û dikanên xwepêşanderan boyaxek taybet bikar tînin. Li aliyeke din Rêberê olî yê Îranê Elî Xamaneyî bi rêya medyaya dewletê îtiraf bi kuştina xwepêşanderan kir û wan wek ‘têkder û alîgirên biyanî’ bi nav kir. Her wiha Dozgerê Giştî yê Tehranê jî daxwazên ji bo betalkirina darvekirina xwepêşanderan red kir û got: “Wê bersiva dadwer zû zelal bibe û gelek dosya ji bo dadgehê hatine şandin.”

**Hêzên rejîmê êrişî ser xwepêşandanan dikin**

Li gor dîmenên ku li ser torên medya dijîtal hatine parvekirin, di roja 14’emîn a xwepêşandanan de hêzên rejîmê bi şêwazek tûnd êrişê ser xwepêşandanan dike. Kesên ku di xwepêşandanan de birîndar dibin, ji tirsa ku ew ê li nexweşxaneyan werin binçavkirin, nikarin serî li nexweşxaneyan bidin. Lê tevî vê yekê jî xwepêşandana gelên Îranê li 512 navçe, 180 bajarok û 31 parêzgehên Rojhilatê Kurdistan û Îranê belav bûne. Heta niha 45 zanîngeh ji bo piştgiriyê tevlî xwepêşandanan bûne. Li gor agahiyan li hin bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê, gelek ji hêzên ewlehiyê û Supayê Pasdaran ji bajar hatine derxistin, dikan û cihên giştî girtîne. Tê gotin ku hêzên rejîma Îranê bi darê zorê û bêyî amadebûna parêzeran îfadeyên xwepêşanderên hatine binçavkirin digrin û li ser medyaya fermî ya Îranê diweşînin.

**Dirûşma ‘Kurdistan, Kurdistan, Goristana Faşîstan’**

Xwepêşandan li bajarê Sine, Seqiz, Kamyaran, Kirmaşan û gelek bajarên din ên Rojhilatê Kurdistanê berfireh dibe. Ji ber êrişa hêzên rejîma Îranê li Kamyaran gelek kes şehîd ketin û gelek jî birîndar bûn. Di saetên êvarî de li bajarê Taxa Nayserî ya Sine, navçeya Kerîm Awa ya Saqiz ên Rojhilatê Kurdistanê ciwan daketin kolanan. Ciwanan bê navber dirûşma ‘Kurdistan, Kurdistan, Goristana Faşîstan’ qîr kirin. Li bajarê Kamyaran xwepêşandan mezin bû. Hêzên rejîmê gule li xwepêşanderan reşand û hinek xwepêşander şehîd ketin û hinek jî birîndar bûn. Li bajarê Kirmaşan û Îslam Abad a rojava, di navbera xwepêşander û hêzên rejîmê de şer derket. Rewşa herêmê aloz e. Hejmara qûrbaniyan nayê zanîn. Li aliyê din li Tehran jî xwepêşandanên mezin hene. Li vir dirûşmên ‘Bimre Dîktatorî’ tê qîrkirin. Li Îlamê jî xwepêşandan bi hemû dijwariya xwe dewam dike. Ciwan li qadan li ber xwe didin.

**Hêzên rejîma Îranê êrişên xwe yên li ser xwepêşanderan didomînin**

Li çend bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê xwepêşandanên li dijî desthilatê xurtir dewam kir û di encama êrişa hêzên rejîma Îranê ya li ser bajarê Melîkşahî, Şîraz û Hemedanê de gelek kes hatin qetilkirin û gelek kes jî birîndar bûn. Di xwepêşandanên li bajarê Melîkşahî ya ser bi Parêzgeha Îlamê ya Rojhilatê Kurdistanê de di navbera xwepêşander û hêzên rejîma Îranê de şer û aloziyên dijwar derketin. Li gorî çavkaniyên ne fermî 7 kes hatin qetilkirin. Li aliyê din li bajarê Şîraz û Kazrûn jî nerazîbûn berdewamin. Li gorî raporan diyar dibe ku hêzên rejîma Îranê êrişên xwe yên ser xwepêşanderan didomînin, her wiha bi dehan kes hatine revandin û binçavkirin.

# ‘Bêdengiya cîhanê felaketa mirovî mezin dike’

Birûc Resûl/Qamişlo

**Koçberên Efrînê diyar kirin ku bi hezaran malbat ji nişkave rastî koçberiyê hatin û wiha gotin: “Di şertên hewaya pir sar, zarok, jin, kesên temen mezin û nexweş ketin rêya koçberiyê, mal û xak li pey xwe hiştin. Em banga li civaka naveneteweyî, rêxistin û saziyên mafên mirovan dikin ku bêdengiya xwe bişkînin.”**

Di tabloya ku bi salan e bê hesabpirsînê didome her dem xwe dubare dike. Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêla bi zorê ya koçberiyê re bû sehne. Ev pêl, welatiyên li taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên bajarê Helebê û di heman demê de bajarê Tebqa û Reqayê digre nava xwe. Koçberî di şertên giran ên ewlehî û mirovî de tê jiyîn. Her wiha ev koçberî, ji binpêkirinên sîstematîk cuda nîn e, berovajî helqeyek nû ya koçberiyê ku bi riya avakirina bêaramî, tirsa regeşiyên leşkerî û polîtîkayên hikûmeta demkî HTŞ`ê û êrişên leşkerên bi pere yên dewleta Tirk e.



Hedla Mihemed



Îmam Berkal

Koçberan zehmetî û helwestên xwe ji Rojnameya me re anîn ziman.

**‘Dewletên navneteweyî li ser hisabê xwîna Kurdan berjewandiyên xwe dimeşînin’**

Koçbera bi navê Hedla Mihemed a bi temen 60 salî diyar kir ku pêwîste hemê saziyên mafê mirovan û cihên berpisiyar bi erkên xwe yên mirovî û exlaqî derkevin û wiha got: “Ev bû zêdeyî carekî em koçber dibin, her wiha ev koçberî jî bi dare zorê ji aliyê çeteyên girêdayî HTŞ`ê û dagirkeriya Tirk vet ê kirin. Ev ne rêbazekî exlaqî ye k utu malbatan ji mal û erda wan bi dare zorê derbixe, bêguman em nikarin li malên xwe jî bimînin, ji ber ku kiryarên dijmirovî di derheqê Kurdan de didin meşandin. Me gelek malbat dîtin ku nexwestin ji malên xwe derkevin, lê piştre me bihîdt ku çawa wan didin kuştin, revandin û komkujiyên malbatî pêk tînin. Lewma em neçar man ku em dîsa koçber bibin, ji ber ku îro dijminekî bi zehniyeta DAIŞ`ê êrişî Kurdan dike û bê rehma, serê zarok, jin û xotên me jêdike bi dilekî sar. Ew dijmin jî bû sedem ku niha bi hezaran malbat li ber serma baran û berfê xew bikin, heya niha cihekî ku em lê cih bibin tueye. Belkî ev saziyên microvan van sûcên li der koçberan tê kirin nabîne, heya kengê dewletên navneteweyî ji bo berjewandiyên xwe û li ser hisabê xwîna Kurdan xwe û siyaseta xwe dimeşînin. Êdî em dibêjin bese ji bêdengiyê re, bese ji bê exlaqî re. bila êdî bi erkên xwe yên exlaqî rabin, bêdengiya wan dibe sedema gelek zarok jiyana xwe ji dest bidin.”

**‘Bila pêdivîn jiyanê ji bo koçberan peyda bikin’**

Hedila Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Em niha nêzî 100 malbat di mizgefta Zên El-Abidîn de ne, ne soba, ne mazot, ne jî batanî û zarokên me hemî biçûkin vê sermayî tehmûl nakin. Ma dilê tu kesî bi hale koçberan na şewite. Êdî em bang li hemî kesê xwe berpisiyar dibînin, kesên xwedî wijdan û mirovî, bila pêdivîn jiyanê ji bo koçberan peyda bikin.”

**‘Di şertên hewaya bi sir û seqem de, zarok, jin, extiyar û nexweş ketine’**

Di heman çarçoveyê de bavekî bi temen 65 salî yê bi navî Îmam Berkal da zanîn ku zarokên wan yên biçûk bî şîr û xwarinin û wiha pê de çû: “Mirov neçar man mal û milkên xwe li pey xwe bihêlin. Em nizanin ku wî zivirinandin hebe ya na. Koç ne tenê malan û hesta ewlehî û aramiyê jî ji destê wan girt. Banga me li civaka naveneteweyî, rêxistin û saziyên mafên mirovan û rêxistinên alîkariya mirovî dikin ku bêdengiya xwe bişkînin. Divê sivîlên di nava dorpêçê de bên rizgarkirin û êrişên li ser cihên ku mirov lê dijîn werin sekinandin. Bêdengiya cîhanê felaketa mirovî mezin dikin û îro êşa bi hezaran malbatên bê mal û bê ewle dijîn çend qat zêdetir dike. Sivîl rastî binpêkirinên, hêzên hikûmeta demkî HTŞ`ê, komên cîhadîst û leşkerên bi pere yên dewleta Tirk a dagirker hatin. Mirovan di nava êrişên giran ên bi çek û topan de, di mercen bi xeter de malên xwe terikandin. Îro em hê jî bawer nakin em çawa bi saxî rizgar bûn. Malbat ji nişkave rastî koçberiyê hatin, tiştên xwe yên bingehîn negirtin, di şertên hewaya bi sir û seqem de, zarok, jin, extiyar û nexweş ketine. Mal û xak li pey xwe hiştin, tabloya derketiye, felaketa tê jiyîn raxist ber çavan.”

# ‘Pêwîst e di serî de azadiya Rêber Apo pêk were’

**Parêzer Ciwan Îso diyar kir ku pêwîst e azadiya Rêber Apo di xetên herî pêş de be. Rêbertî ji bo aramiya civakî û siberojeke demokratîk dixebite, lê dewleta Tirk ji bo azadiya Rêbertî û hemû girtiyên siyasî guhertinan pêk nayîne û got, “Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, demokratîkbûna Tirkiyê bi xwe ye.”**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Parêzerên Rêber Apo di 2003’yan de ji bo mafê hêviyê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê (DMME) dabûn. Piştî serlêdanê di 18’ê Adara 2014’an de DMME’yê biryar da û xwest Tirkiye mafê hêviyê bide Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan. Di ser vê biryarê de zêdetirî 11 sal derbas dibin lê tevî destpêkirina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk jî ev maf ji bo Rêber Apo bi awayekî fermî nehatiye dayîn. Her wiha mafê hêviyê pir dereng maye. Ji ber qonaxa çareseriyê bi îradeya Rêber Apo hatiye destpêkirin, girînge ku Rêbertî bixwe vê qonaxê birêve bibe.

Derbarê mafê hêviyê ya ji bo Rêber Apo û hemû girtiyên siyasî de, parêzer Ciwan Îso ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Rêber Apo ji bo siberojeke demokrat têkoşînê dewam dike’

Ciwan Îso diyar kir ku dewleta Tirk derbarê pêvajoyê de tu gav neavêtiye û dibe ku navêje jî û wiha got: “Ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokartîk Rêber Apo baş li ser kar kir û gelek gavên pratîkî li ser erdê hatin avêtin, ji bona pêşeroke democrat li tirkiyê ku karibe her kes weke heyînekî di nav de jiyan bike, mafê hiqûqî destûrî ya gelê Kurd bi dest bixe, civakek aştiyane ava bibe. Lê di nêrîna min de dewleta Tirk heya roja îro ji bo pêvajoyê tu gav neavêtiye, dibe ku navêje jî. Ev jî dibe sedem ku ew hişmendiya li dijî mafê gelan û demokratbûna sîsteman hîn dewam dike. Herwiha guhertin rojane di Rojhilata Navîn de çêdibin, kêm zêde gav li ser erdê tên avêtin, şoreşên demokratîk hene ji bo mafê xwe bistînin. Lê mixabin dewleta Tirk ruxmî ku projeya Rêber Apo pêşkêş dike, pêkanîna demukrasiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Tirkiyê, rûxmî hemû gavên ber bi çav yên ku Rêbertî û tevgera azadiyê avêtine, lê dewleta Tirk heya niha bi cidî tevnegeriyaye. Ev jî tê wateya ku Tirkiyê dixwaze bi rê û rêbazên din, vê projeyê bê encam bihêle, an jî têk bibe, dîsa jî li gorî xwe siyasetê bimeşîne û pêvejoya heyî bixetimîne û tu gavan navêje. Tişta ku dewleta tirk dike ne tenê di hundirê Tirkiyê de, herwiha vê yekê di hundirê Sûriyê de jî dike.”

### ‘Dewleta Tirk guhertinên ber bi çav pêk neanî ne’

Ciwan Îso eşkere kir ku ji aliyê Tirkiyê ve tu guhertinên pratîkî li ser erdê nehatiye kirin û wiha anî ziman: “Rûxmî gavên ku hatine avêtin û eve salek jî bi ser pêvejoyê re derbasbûye, lê tu gav ji milê tewleta tirk ve heyanî neha nehatine avêtin. Ji bona rewşa Rêber Apo di Îmralî de ku hîn ew jî tu guhertin di wê de çênebûye. Ya din jî hîn bi hezaran girtiyên siyasî di zinadanên Tirkiyê de ne, ji bo vê yekê jî Tirkiyê tu xebat heya niha nekiriye. Lewra eger siyaseta dewleta Tirk li ser vê xetê dewam bike, îhtîmal ev projeyên hene tev de têk bibe û dîsa Tirkiyê vegere wek rewşa xwe ya berê. Rêber Apo jî vê naxwaze û di daxuyanî û bangewaziyên xwe de dibêje; Gerek em bi hev re Tirkiyek demokrat, civakek demokrat ku her kes xwedî mafê xwe yê destûrî be û em li gorî wê jî jiyan bikin ava bikin.” Herwiha tevî ku di ragihandina Tirkiyê de yan di hevdîtinên wan de dibêjin em ê li ser kar bikin û em ê komîteyan ava bikin, lê di rewşa siyaseta Tirk de heya niha tu guhertin nehatiye kirin.”

### ‘Erka her kesî ye ku rê li ber şerê salan tê kirin bigire’

Ciwan Îso di berdewamiya axaftina xwe de tekez kir ku ji her kesî tê xwestin ku rê li ber şer bigirin û wiha bilêv kir: “Ji her kesî tê xwestin, gelê Tirk, Kurd û hemû gelên di hundirê Tirkiyê de jiyan dikin ku rê li ber şerê ku bi dehê salan tê kirin, bigirin. Ji bo vê jî pêwîst e civaka Tirkiyê hemû jî bikeve nava tevgereke mezin de, gerek saziyên sivîl, saziyên mafên mirovan û saziyên hiqûqî di hundirê Tirkiyê de tev bi hevre di nava kar û xebatê de bin, ji bo pêvajo here serî. Herwiha xalên ku di hundirê projeyê de hatine tesbîtkirin li ser erdê pêk bên, ev jî wê bikeve xizmeta hemû siberoja Tirkiyê de, ji bo aramiya wê û pêşketina dewleta Tirk di gelek dosayan de, doza mafê mirovan û hwd… Li ser vî bingehî jî pêwîst e gavên pir girîng bên avêtin. Lewam ji bo vê yekê di asta yekemîn de ji hikumetê





tê xwestin, hem ji parleman û ji serok komarê Tirkiyê jî tê xwestin vê pirsgirêkê çareser bikin, ji bo azadiya Rêber Apo û hem jî ji bo demokratbûna Tirkiyê pêwîste ku ev yek pêkwere.”

### ‘Pêwîst e Rêber Apo bi xwe pêvajoyê bi rêve bibe’

Ciwan Îso axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo dewleta Tirk karibe pêvajoya aştiyê ji bo giştî pêş bixe, gerek danûstendinên bi Rêber Apo re ne tenê zêde bibin, di heman demê de mezintir jî bibin û bi awayekî fermî rewşa Rêber Apo ya niha tê de bê guhertin ku ji Îmraliyê derkeve, projeya xwe ya pêşkêş kiriye ew rêveberiya wê bike. Rêber Apo bi xwe dibêje ez amade me û derfetê min ên takekesî, hişmendî, qanûnî û destûrî hene ku ez vê projeyê li ser erdê pêk bînim. Îrade heye û ew îmkan jî li cem Rêber Apo peyda dibin. Lewma da ku ev yek pêk bê û pêvajo biçe serî, aliyê wê yê pratîkî jî ev e; şer bê rawestandin, aştî li Tirkiyê pêk bê û mafê Kurdan li wir were qebûlkirin. Yanî niha gav ne tenê hevdîtin û serdan bin, di vî alî de ku gelek astengî jî derdikevin, lê gerek azadiya Rêber Apo di xetên herî pêş de be. Ji ber ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo wê karibe hem danûsitandinên xwe, nêrînên xwe û bandora xwe li ser Tirkiyê tevahî jî bike ku pêvajo biser bikeve. Lê dewleta Tirk hem ji bo hevdîtinan û hem jî ji bo mijarên din, astengiyan dide pêş. Ev jî wê ne di berjewendiya dewleta Tirk a demdirêj de be. Eger ev astengî dewam bikin, wê dîsa rewşa Tirkiyê vegere mîna berê û xerabtir jî bibe, di nêrîna min de jî ne gelê Tirkiyê û ne jî gelê Kurd vê yekê qebûl dikin, ji ber hemû baweriya wan bi vê projeyê heye. Ji bo wê ya girîng maseya danûsitandinê ya diyalogê li ser bingehek ku mafê gelan di hundirê destûrê de bê bicîkirin, parastin û erêkirin e.”

FENER

## Dema Ku Welatek Di Çarçoveya Teng A Navendî De Were Nixandin, Encam Şer û Îxanet e



**Idrîs Henan**

Dema ku ragihandin bibe amûreke nerim a hegemoniya çandî û ji nû ve têgehên dewlet, yekîtî û nasnameyê li gorî eznavendiyek hişk pênase bike, qirkirin û înkara pirengiyê dikeve dewerê. Ji xwe ti derfetên jiyanê di vê rewşê de namînin û kaos weke goka agir dinepixe. Li kuderê jî biteqe, komkujî, qeyran, qetilkirina li ser nasnameyên etnîk û mezhebî dibin çand û ferzekî jiyanê. Ji bona ew realîte jî bibe realîte, alavên ragihandinê vediguherin fabrîkayên şantaj û gefxwarinê ku kêmî çirkeyekê de dikarin bi hezaran agahiyan berovajî bikin û xîtabekî wisa dûrî pîvanên sinc û gerdişan çêkin û raya giştî jî li gorî wê bidin nîgarkirin. Ji xwe li vir tiştek bi navê têgehên dîrokî namîne. Her tişt li belansa durûtiyê dikeve û jirêderketin jî weke heqîqet tê ferzkirin. Yanê ne prensîb û ne jî pabendiya mirovî û exlaqî heye. Tenê qezenc û qezenca zêde ya ku bi eznavendiya hişk re mezin dibe re heye.

Lê binêrin, gelek saziyên ragihandina ku ji aliyê welatên kendavê yên weke Qatar û Siûdî Erebistanê ve tên fînansekirin, qonaxa têkbirina terora DAIŞ li ser destê şervanên QSD şopandin û bi cîhanê re parve kirin. Îroj heman ragihandin dezenformasyonê dikin û DAIŞkirina civakê weke altirnatîfa QSD diyar dikin. Ango; siyaset li gorî hêz û merada sponseran dikin. A sosret ew e ku; kesên herdu qonax weke rojnamevan şopandine yan gengeşe kirine, heman kes in. Lew re jî em dibêjin maşîne û fabrîke ku weke robotan dixebitin û tenê hewceyî pêlkirina amûra vêxistinê ne ku tabloya çapemeniya bê exlaq were neqişandin. Çapemeniya ku tundrewiyê rûbirûyî demokrasiyê dike, nirxan berovajî dike û her tişta xwedî xisûseke demokratîk be weke cudaxwazî bi nav dike. Bi gotinek din, çi projeyên ku bi pîvanên wan re li hev neke, cudaxwazî û parçekirin e!

Ji ber wê jî mirov nikare zûbizû, rastî nirxandinek bêalî ku karibe bibe refleksa helwesteke siyasî were. Ya heyî jî pêşdaraziyeke çapemeniya hegemoniya çandî ye ku li ser bingeha hinek fikir û texmînên ferazî yên bê kok û bê belge helwest daye avakirin e. Ti têkîliya xwe bi realîteyê re nîne. Hewl dide çi tezekî rêveberiya demokratîk hebe, weke dijminê yekparabûna dewletê xuya bike. Di encamê de dewleta hişk a navendî ye. Ji ber vê jî mirov di êrişa çandî de her tiştî weke hev dibîne ku jêdera hişmendî yek e. Îroj li Sûriyê jî bi ferzkirina HTŞ re ev hişmendî ji nû ve serwer dibe. Çawa ku rejîma Baas dikir, rejîma heyî jî dike. Projeya Rêveberiya Xweser ku çarçoveyek pirengî û gerantiya mafên neteweyî û çandî ye, qebûl nake û li dijî wê jî êrişên qirkirin û tunekirinê pêk tîne. Jêdera bingehîn a vê nihêrandinê jî ew e ku; dewlet berî hiqûq û mafan e. Îcar çapemeniya paralel jî li ser bingeha serwerkirina vê hişmendiyê hişê civakê ava dike ku çi dengvedanek dijber be jî, di dergûşê de dikujin. Di encamê de paşguhkirina dîrokî ya gelan û biçûkirina dozên mafdar e.



# Piştgiriya rewşenbîriya Kurdistanî ji bo berxwedaniya Rojava gihiştiye lûtkeyê

**Li dijî van planên qirkirinê yên ku ji hêla çeteyên hikumeta HTŞ’ê û dewleta Tirk ve li ser gelê Kurd tê meşandin, gelek rewşenbîr, nivîskar, oldar û hunermendên Kurd li seranserî Kurdistan û diyaspora piştgiriya xwe raber dikin.**



**Navenda Nûçeyan**

### ‘Ji azadî û berxwedaniyê tiştek birûmettir tuneye’

Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê (TEV-ÇAND), Tevgera Çanda Jinên Hîlala Zêrîn, Desteya Çand û Ronakbîriyê ya Kantona Cizîrê, Dîwana Wêje û Yekitiya Hunermendan ji bo rewşa seferberiyê ya ku li hember êrişên komên çete yên girêdayî hikumeta demkî ya Sûriyeyê daxuyaniyek da û wiha gotin: “Ji azadiyê birûmettir tiştek nîne. Bila dewleta Tirk a faşîst û çeteyê wê, HTŞ û çeteyên wê baş bizanin ku em tu carî bêrûmetiyê qebûl nakin û dev ji azadiya gelê xwe bernadin. Li hember hemû êrişên hovane û qirker, em ê wek hunermend û xebatkarên çand û hunerê heta dawiyê axa xwe, bajarên xwe biparêzin.”

### ‘Heta guleya xwe ya dawî ez ê bi şervanên Kurd re bim’

Şêx Murşid Elxiznewî li ser hesabê xwe yê X’ê (medyaya dîjîtal) wêneyê şervanekê YPJ’ê parve kir û bal kişand ser berxwedaniya Rojavayê Kurdistanê. Şêx Murşîd Xeznewî di peyama xwe de bal kişand ser Kurdan û berxwedana Rojava. Heta guleya dawî ya xwe ez ê li gel şervanên Kurd bim û ez ê beşdarî berxwedana Rojava bibim. Parastina Rojava ne tenê peywireke leşkerî ye, di heman demê de peywireke olî û wijdanî ye jî. Di van rojên dijwar de gelê xwe bi tenê nahêle û li hemberî hemû êrîşan dê li qadê be.”

### ‘Gelo Colanî Mezlûm Dogan nas dike, heya radestbûn ji Mezlûm Ebdî xwest?’

Derbarê destpêkirina êrişa çeteyeyên Colanî û hikumeta HTŞ’ê li ser Kurdan û xweradestkirina QSD’ê de romannivîsê Kurd Helîm Yûsiv li ser malpera xwe ya fermî ya Feecbookê wiha got: “Gelo Ebû Mihemed Elcolanî bi çîroka berxwedaniya Mezlûm Dogan nizane heya ku ji Genêral Mezlûm Ebdî xwestiye ku xweradest bike. Bêguman Colanî nizane, eger bizanîba ew ê ev yek ji Mezlûm nedixwest.”

### ‘Bijî berxwedaniya ku nayê têkbirin’

Bi posteke din Helîm Yûsiv berxwedaniya gelê Kurd yên seranserî Kurdistan û cîhanê wiha silav kir: “Hevgirtina gelê Kurd a ku îro li ber çavê me raber dibe, hîna di dîroka nêz de ev yek çênebûye. Bijî berxwedaniya hemû kesên li her çar parçeyan heyanî Kurdên diyaspora ya ji bo Rojava. Bijî berxwedaniya ku nayê têkbirin.”

### Kolektîva Saza Êzî li navenda Çand û Hunerê ya Şengalê piştgirî da Rojava

Xelkê Şengalê li dijî êrişên li ser Rojavayê Kurdistanê bi hemû beşên xwe di tevgerê de ye. Piştgiriyek jî ji Kolektîva Saza Êzî ji bo berxwedana Rojavayê Kurdistanê hat. Dengbêj û tembûrvanên Êzidî bi nîşandana helwesta xwe û gotinan stranê piştgiriya xwe ya ji bo Rojavayê Kurdistanê nîşan dan. Hunermend diyar kirin, ew ê bi tembûr û stranên xwe piştgiriyê bidin berxwedanê.

‘Em ê bi tembûra xwe li gel berxwedana Rojava bin’

Daxuyaniya Kolektîva Saza Êzî li navenda Çand û Hunerê ya Şengalê ji aliyê dengbêj û tembûrvan Berces Xelef û Îdo Çêlkî ve di 21’ê Çileya 2026’an de hate dayîn. Dengbêj û tembûrvan bi tembûra xwe daxuyanî dan. Dengbêj Berces Xelef destpêkê berxwedana şervanên QSD’ê silav kir û got: “Her bijî egîdên Rojava ku şerekî mezin didin. Em jî bi deng û tembûra xwe bi gelê xwe yê Rojava re ne. Çeka herî mezin ev tembûr e, em jî bi tembûra xwe li gel wan in. Heya dilopek xwîn di laşê me de heye, emê li pişt wan bisekinin. 2014’an xelkê me bi germî pêşwazîkirin. Îro jî wextê wê ye em jî vî barê wan ê giran hinekî bigirin ser milê xwe. Em hêvî ji Xwedê dikin, gelê me timî serkeftîbe. Her bijî çar parçeyên Kurdistanê. Her bijî xortên Êzidxana delal. Hezar rehm li wan şehîdên ku xwîna xwe ji bo parastina axa me dane be.”

‘Em Rojava pir baş fam dikin’

Hunermend Îdo Çêlkî jî peyameke kurt da û got: ‘‘Em êşa Rojava baş dizanin, ji ber tu kes bi qasî Şengalê û Êzidiyan ferman nedîtiye. Hêvî dikin ev şer raweste û tifaq çêbibe. Bila şerê li dijî mazlûman bisekinînin û ji me dûr bixin. Silavê me ji xelkê me yê Rojava re heye. Ew gelek tişt ji bo me kirin. Em ê bi stran û tembûra xwe li pişt wan bisekinin.”

Piştî axaftinên di daxuyaniyê de hunermend Îdo Çêlkî li tembûrê xist dengbêjê navdar ê Şengal Mirad jî stranek ji bo piştgiriya Rojava got.

### Zanîngeha Koye: Divê her kes mafê Kurdan biparêze

Di çarçoveya piştgiriya ji bo Rojavayê Kurdistanê de li zanîngeha Koye berxwedana Rojava hate silavkirin û banga xwedî derketina li Rojava hate kirin.

Seferberiya ji bo Rojavayê Kurdistanê hatî ragihandin, her ku diçe berfirehtir dibe. Divê çarçoveyê de li zanîngeha Koye ya li Hewlêrê piştgiriya berxwedana Rojavayê Kurdistanê hate kirin û çalakiyek hate lidarxistin. Xwendevan û mamostayan êrişên çeteyên hov bi tundî şermezarkirin.

Serokê zanîngeha Koye Dr. Mihemed Hesîb ji ajansa mere axivî û got; “Îro em weke mamosta û xwendevan îro ji bo piştgiriya berxwedana Rojavayê Kurdistanê kom bûne. Ji ber ku zanîngeh cihê zanist û exlaqe, lewma divê dijî hemû êriş û komployên ser gelê me rawestandin. Ez bang li civaka navnetewî dikim ku bi erkê xwe rabin, divê rê li komkujiyên bi ser Kurdan bigirin. Divê her kes mafê Kurdan biparêze.”

Ji bilî van çalakiyên hatin lidarxistin, di hemû waran de, di warê civakî, siyasî, leşkerî û hwd… çalakiyên piştgirtiyê hîna ji bo Rojavayê Kurdistanê tên domandin.

# ‘Min bi tabloya xwe yekîtiya Kurdan da xuyakirin’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Wênesaz Hukmet Ibrahîm anî ziman ku wî tabloya xwe yekîtiya gelê Kurd daye xuyakirin, ev tablo tê wateya ku eger gelê Kurd nebe yek wê konê penaberiyê her tim li ser piyên Kurdan be.**

Hukumet Ibrahîm wênesazekî Kurd ji Qamişloya Rojavayê Kurdistanê ye ku bi dehan tabloyên hunerî yên wênesaziyê çêkirine. Yek ji van tabloyan pirseke gelê Kurd vedibêje. Derbarê vê tabloyê de Hukmet Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

### ‘Min bi tabloya xwe yekîtiya Kurdan da xuyakirin’

Hukmet Ibrahîm destnîşan kir ku wî di tabloya xwe de xwestiye yekîtiya gelê Kurd bide xuyakirin û wiha domand: “Berî ku pêşangeha wêneysaziyê li



Kobanê li dar bikeve min ev tablo xêz kir û di salvegera roja Kobanê ya cîhanî de tevlî pêşangehê kir. Min xwestiye bi riya vê tabloyê bêjim ku eger Kurd nebin yek dara azadiyê şîn nabe û wê konê penaberiyê li ser piyê me be û em ê penaber bimînin. Min sê dar tê de xêz kirine, ew her sê dar jî tê wateya ku eger yekrêziya Kurdan çênebe wê dara azadiya Kurdan şîn nebe. Her kesayeteke rewşenbîr li gorî şêwaz û karîna xwe xebatê dike. Hewldanên rewşenbîran di milê yekîtiya Kurdî de hene, min bi riya tabloyên xwe mijara yekrêziya Kurdî û rewşa Kurdan nîşan dan. Xwesteka rewşenbîran heye di warê piştgirtiya yekîtiya Kurdî de, ew tiyên xebata netewî ne. Ew xebatê dikin, hewldana pênûs û rîşeyên rewşenbîran hene, lê hewldanên wan nagihêjin serî ji ber ku pirsgirêkên siyasî hene di nabera aliyên Kurdî de.”

### ‘Ez ê tabloyeke têkildarî Şehîd Denîz çêkim’

Ibrahîm eşkere kir ku ew ê tabloyekê li ser kuştina Şehîd Denîz xêz bike û wiha got: “Me dît ku çawa hikumeta Colanî û çeteyên girêdayî wî êrişî Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Êrişeke hovane li hemberî gelê Kurd kirin ku hejmara wan 50 hezar çete bû. Li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê berxwedaniyek hat raberkirin, di bala min de heye ku vê berxwedaniyê bikm nameyek hunerî û bikim mijara tabloyekê. Ji hêleke din ve ez ê tabloyekê li ser Şehîd Stêra çêbikim. Şehîd Denîz şervana ku tevî şehîd bû jî, wan hovan ew ji avahiyê de avêtin erdê nav kavilan. Ez di warê amadekirina tabloyan de berdewam im, heya niha min nêzî 20 tablo xêz kirine, lê hin astengî hene ku ez bi sedema wan zorê dikişînim. Nebûna cihekî guncav ji bo xebata min a hunerî, sedema din jî hêza min a madî tuneye piştgiriya aborî ji bo min nayê kirin. Lê tevî wiha jî ez xebata xwe ya xêzkirina wêneyan ranawestînim.”

### ‘Eger yekbûna Kurdan pêkwere wê rewş gelekî were guhertin’

Wênesaz Hukmet Ibrahîm tekez kir ku eger yekrêziya Kurdan çêbibe wê rewşa gelê Kurd were guhertin: “Wekî tê zanîn, di 26 Nîsana 2025’an Konferansa Yekhelwestiya Kurdî li dar ket, em dibînin ku divê ew konferans û biryarên wê, bikevin warê pratîkî û li pêş bikevin, ne tenê ximavek be li ser rûpelan. Dema heyî gelekî hestyar e, ji ber ku kesên ku desthilatdariya Şamê dikin, kesên hov in, ji hişmendiya xwe nikarin dûr bikevin, DAIŞ in, bi kincên din hatine serweriya Şamê dikin. Eger gelê Kurd yekrêz ba, wê rewşa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ne wiha ba di roja îro de. Yekîtiyeke Kurdan hebaya, derfet hebû, Silêmanî û Mihabad, hem jî hemû riyên bajarên Kurdistanê vekirî bûn ber bi Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, wê rê nebûbaya kelemek li pêşya destekdayîna her du taxan. Piştî vê êrişê em hewcedar in ku Pêşmergeyên Roj bi QSD’ê re berevaniyê di ber Kurdan û Rojavayê Kurdistanê de bikin. Divê hêzeke hevbeş a leşkerî çêbibe û lêvegerek çêbibe, şaştî û pirsgirêk werin çareserkirin da ku yekrêziya Kurdî pêkwere û şaştiyên ku çêbûn nema bêne dubarekirin.”

# Hikumeta demkî şerê av û elektirîkê li dijî Kobanê dide meşandin

**Êrişên dawî ji hêla çeteyên girêdayî hikumeta demkî ya Sûriyê ve û bi taybet destserkirina bendavan, encamên pir xirab bi xwe re anîn. Bi taybet li bajarê Kobanê li dijî gel şerê avê û elektirîkê tê meşandin. Kiryarên hikumeta demikî xeteriyeke mezin li ser jiyana welatiyan çêdike .**

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Aloziya mirovî li bajarê Kobanê ku di bin dorpêçeke dijwar a ku ji hêla çeteyên girêdayî hikumeta demikî ya Şam ve hatiye ferzkirin, berdewam dike. Ev dorpêç bûye sedema qutbûneke bi giştî ya avê piştî ku bendava Tişrînê ketiye bin kontrola çeteyan de. Qutkirina bi giştî ya avê ji hêla çeteyên girêdayî hikûmeta demkî ya Şamê ve jiyana sivîlan li Kobanê di bin xeteriyeke mezin de dihêle.

Bendavên li ser çemê Firatê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bingeheke aborî ya giring heye, ku guherînên di xebitandina wan de, qutbûna elektrîkê û avê rasterast bandorê li ser hilberîna çandinî û pîşesaziyê dike, lêçûnên jiyanî zêde dike di heman demê de aramiya bazarên herêmî û aboriya herêmî dixe bin xeteriyê.

### Giringiya Bendava Tişrînê

Bendava Tişrînê di navbera salên 1991 û 1999'an de hatiye avakirin û yek ji projeyên avê yên herî giring û stratejîk li Sûriyê tê hesibandin. Bendava Tişrînê piştî Bendava Firatê duyemîn bendava herî mezin e. Ew dikeve li ser Çemê Firatê li bakurê Deşta Sûriyê, bi qasî 115 km dûrî bajarê Helebê ye, 80 km dûrî sînorê Tirkiyê û 28 km li başûrê Menbicê ye, li herêmek ku bilindahiya wê di navbera 400 û 600 metreyan de ji asta deryayê ye.

Bendav bi qasî 900 metre dirêj e, kapasîteya depokirina deryaya wê bi qasî 1.9 milyar metrekup av e, ku ew dike depoyek avê ya giring ji bo herêmê. Bendava Tişrînê roleke sereke di rêxistina herikîna Çemê Firatê, dabînkirina ava vexwarinê û avdana deverên çandiniyê yên berfireh de dilîze, ku bi qasî 200,000 hektar tê texmînkirin. Nêzîkî pênc milyon kes rasterast an nerasterast xwedispêrin wê avê, ku ew dike ciheke bingehîn di piştgiriya ewlehiya xwarinê û aramiya debara jiyanê de li bakurê Sûriyê.

Santrala hîdroelektrîkê ya li Bendava Tişrînê şeş yekîneyên hilberîner ên cureya Kaplan bi hemî pêvekên wan ve dihewîne. Her yekîneyek kapasîteya wê 105megawat e, ku kapasîteya giştî ya santralê digihîne 630 megawat. Zexta herî zêde ji bo xebitandina yekîneyan 30 metre ye, zexta herî kêm 15.5 metre ye, zexta qiyasî jî 26 metre ye. Xebatên çêkirina bendavê di sala 1991'an de hat destpêkirin, avakirina wê 8 salan berdewam kiriye, da ku di sala 1999'an de bi awayekî fermî bikeve xizmetê. Ji 8'ê Kanûna 2025'an vir ve, Bendava Tişrînê rastî êrişên dubare ji aliyê artêşa dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatiye, ku di encamê de ziyanên mezin gihîşt binesaziya bendavê, di nav de qutbûna elektrîkê û asta avê ya pir bilind li beşên jêrîn ku gihaşt astên xeternak. Ev êriş gefê rasterat li ewlehiya bendavê dike, eger berdewam bikin, dikare bibin sedema karesateke mirovî û jîngehî ya berfireh ku bandorê li bi mîlyonan şênî û deverên çandiniyê yên derdorê bike.

### Bendava Firatê

Di çarçoveya pergalên bendavên hîdroelektrîkê yên li ser Çemê Firatê de, Bendava Tebqayê (Bendava Firatê), ku li nêzîkî bajarê Tebqayê li Reqayê ye, wekî bendava herî mezin a Sûriyê derdikeve pêş. Li pişt wê Gola Tebqayê heye, ku mezintirîn depoya avê li Sûriyê ye. Bendava Firatê, ji bilî hilberîna elektrîkê, di dabînkirina ava avdanî û vexwarinê de roleke giring dilîze. Li gorî texmînên ji çavkaniyên herêmî, kapasîteya wê ya sazkirî ya qiyasî ji 800 megawatî derbas dibe, lê kapasîteya xebitandinê ya heyî ji nêzîkî 200 megawatî derbas nabe.



Ev dane giringiya stratejîk a bendavên Tişrîn û Firatê di nav sîstema ewlehiya av û enerjiyê ya Sûriyê de ye, xeteriya her hedefgirtineke dagirkirina wan wê encamên karesatbar yên xirab li ser mirovan, jîngehê û aboriya herêmê nîşan bide.

### Bikaranîna şerê av û elktrîkê

Rewşa jiyan û mirovî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî li kantona Cezîrê û bajarê Kobanê, piştî pêşketinên dawî yên di derbarê kontrolkirina bendavên sereke yên li ser Çemê Firatê de, di serî de Bendava Tişrînê ku bi awayekî mezin xirab bûye. Ev bendav çavkaniya sereke ya av û elektrîkê ne ji bo bi mîlyonan şêniyên herêmê, her astengiyek di rêveberiya wan de rasterast bandorê li jiyana rojane ya sivîlan dike.

Bi kontrolkirina çend ji van avahiyên giring ji aliyê hikûmeta demkî ya Sûriyê ve, bi piştgiriya rasterast a dewleta Tirk a dagirker, herêm ket qonaxek nû ya gelek aloziyan. Qutbûna av û elektrîkê pir caran li gelek deveran berdewam bû, bi taybetî li bajarê Kobanê. Bajarê Kobanê, ku jixwe ji dorpêçkirinek teng û erdnîgariyek bi tecrîd êş dikşand, îro xwe bê çavkaniyên sabît ên elektrîk an avê dît, ku êşa niştecihên wê heta radeyek bêhempa girantir kir.

### Kobanê rastiyeke bi êş jiyan dike

Pompkirina avê ji ber qutbûna elektrîkê li stasyona pompkirinê ji bo demên dirêj rawestiyaye, ku ev yek hiştiye ku niştecih neçar bimînin ku xwe bispêrin çavkaniyên alternatîf ên biha û pir caran ne ewle.

Dayikên li bajar Kobanê, ku bi rewşên dijwar re rû bi rû ne, neçar mane ku ji bo dabînkirina avê ji bo zarokên xwe rêbazên kevnar û nepaqij bi kar bînin. Gelek dayikan dest bi berhevkirina berfê kirine û di nav malên xwe de di potikan de dihelînin da ku ava vexwarinê peyda bikin. Ev dayik bi hemû hêza xwe têdikoşin heta ku çend dilop av ji bo zarokên xwe peyda bikin. Ev dîmena tirsnak tiştên ku bajar zêdetirî deh sal berê, di dema dorpêçeke hovane de di şerê li dijî hêzên tarî yên Dewleta Îslamî de kişandiye tîne bîra mirov. Lêbelê, vê carê rewş hîn xirabtir e, ji ber ku êş bi lez zêde dibe, kes piştgirî an alîkariyê pêşkêş nake.

Ev rastiya trajîk, ku asta binpêkirinên mafên mirovan ên dubarekirî li herêmê nîşan dide. Dorpêça li ser bajêr bi avê ve sînordar nebûye; lê dabînkirina xwarin û şîrê zarokan jî qut kiriye. Di encamê de sivîlên li Kobanê bi gefa rastîn a mirina zarokan ji ber birçîbûn û kêmasiyê re rû bi rû hiştiye. Di nav germahiyên pir nizm de, niştecih ji nebûna giştî ya elektrîkê û sotemeniyê dikişînin, ku jiyana rojane li bajêr ne mumkin dike.

Aloziya elektrîkê bûye sedema rawestandina giştî ya dezgehên giring, ji nexweşxane û navendên tenduristiyê bigire heta nanpêjxane û dibistanan herwiha torên ragihandinê û xizmetên şaredariyê. Ev qutbûna domdar, heta pêdiviyên herî bingehîn ên jiyana rojane jî veguherandiye têkoşîneke rojane ya ji bo jiyanê.

Kontrolkirina bendavan êdî ne tenê mijarek teknîkî an xizmetguzarî ye; ew bûye amûrek zexta siyasî û leşkerî. Kêmkirina asta avê û kêmkirina hilberîna elektrîkê bi zêdebûna leşkerî û aloziyên siyasî re hevdem bûye, ev yek hişt ku rêxistinên mafên mirovan û mirovî hişyariyê bidin li dijî karanîna av û enerjiyê wekî çek li dijî sivîlan. Ev rewş di mehên zivistanê de hîn xeternaktir dibe, dema ku niştecih ji bo germkirinê hewceyê elektrîkê ne di heman demê de pêşîgirtina li nexweşiyan hewceyê ava paqij in. Bi taybetî bajarê Kobanê rewşek mirovî ya dijwar dijî. Bajarêku sembola berxwedanê ye, niha bi qutbûna domdar a elektrîkê, avê û lêçûnên jiyanê yên zêde dorpêçkirî ye, bêyî ku çareserî bê dîtin ku aramiya civakî li tevahiya herêmê tehdît dike.





# 'Rojava ji bo çar parçeyên Kurdistanê xeta sor e'

**Hevseroka KCDK- E' Zubeyde Zumrut da zanîn ku dewleta Tirk sîstema Rêveberiya Xweser qebûl nake û wiha got: "Hêzên desthilatdar pergala Netewa Demokratîk û destkeftiyên şoreşa Rojava wekî gef li ser desthilatdariya xwe dibînin û hewil didin wê têk bibin."**

**Aryen Hesen/Qamişlo**

Ji bo têkbirina destkeftiyên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, ji 6'ê Çiliyê ve û heta niha êrişên çeteyên hikumeta demikî a Sûriyê li ser Rojavayê Kurdistanê dewam dikin. Ji bo şermezarkirina êrişan gelê Kurd li Kurdistan û tevahî cîhanê rabûn ser piyan.

Di derbarê peyama dawî ya Rêber Apo û xeteriya li ser Rojava hevseroka KCDK- E' Zubeyda Zumrut ji Rojnameya me re axivî.

### 'Dagirker dixwazin destkeftiyên Rojava tune bikin'

Zubeyda Zumrut diyar kir ku gefên li dijî Rojavayê Kurdistanê hertim di rojevê de ne û wiha got: "Dewleta Tirk di destpêkê de têkilî bi DAIŞ'ê re kir û niha jî bi hikumeta demkî a Sûriyê (HTŞ) re dike ku ew hikumet berdewamiya zihniyeta DAIŞ'ê ye, lê navê xwe guhertiye. Di dema niha de têkiliyek xurt di navbera HTŞ û dewketa Tirk a dagirker de heye û dewleta Tirk HTŞ'ê birêve dibe. Bi taybet di warî diplomasiya Tirkiyê ya ku Hakan Fîdan li ser Rojhilata Navîn dimeşîne, tev ji bo têkbirina destkeftiyên Kurdan li Rojavayê Kurdistanê ye, ew hewil didin van destkeftiyan tune bikin. Ji ber ku vê sîstema demokratîk li ser desthilatdariya xwe wekî gef dibînin. Serokê hikumeta demkî a Sûriyê Colanî ji aliyê Tirkan ve tê



birêvebirin û hemamn rêbazî li dijî Kurdan dide meşandin. Dewleta Tirk ji demên kevin ve û heya roja me ya îro polîtîkayên dijminahiyê li dijî gelê Kurd dimeşînin. Piştî banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ku ji aliyê Rêber Apo ve hat kirin, asta êrişên li ser Rojava kêm bûn, lê gef dewam kirin.

Di hevdîtinên rayedarên Tirk ku di girava Îmraliyê de bi Rêber Apo re hatibûn kirin, ne tenê mijara çareserkirina pirsgirêka Kurd hate nîqaşkirin, wan dixwest destkeftiyên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê bên teslîmkirin. Ji xwe berdewamiya êrişan jî berdewamiya wê ye. êrişên wan di 6'ê Çile de ji taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê dest pê kirin û heta îro jî li ser tevahî Rojavayê Kurdistanê dewam dikin. Ev yek jî nayê qebûlkirin ji ber ku gelê Kurd ev 14 sala têkoşîn û berdêlên giran didin. Gelê Kurd xwest sîstema xwe ava bike. Desthilatdar jî ji vê pergelê acizin ji ber ku ev pergal, pergaleke demokratîk e. Lê ema ew kesên ku parastina şer dikin, biryara şer dane û şer didin meşandin pergala demokratîk ne li gorî berjewendiyên desthilata wan e. Niha jî ew kes ku qaşo xwe hikumet binav dikin rêya desthilatdariyê berdewam dikin û komkujiyan pêktînin, sivîlan qetildikin û nexweşxaneyan hedefdigirin. Li beramber van kiryarên dijmirovî û sûcên şer bêdengiyek jî heye."

### 'Dewleta Tirk ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd gavan navêje'

Zubeyda Zumrut wiha domand: "Demeke dirêj bû ku hevîdîtin bi Rêber Apo re nedihatin kirin, lê ev nêzî sal û nîvekê ye ku heyeta DEM Partî hevdîtinê bi Rêber Apo re dikin, herwiha heyeta dewleta Tirk jî diçin û hevdîtinan dikin. Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd di zemînek demokratîk de gav avêt û bangewazî kir. Bi bangewaziya Rêber Apo re ji aliyê Kurdan ve gavên mezin hatin avêtin. Lê ema li beramberî wê dewleta Tirk ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd tu gav neavêtin. Di 16'ê Çile de DEM Partî hevdîtin li girava Îmraliyê bi Rêber Apo re kir. Dîsa jî Rêber Apo balê dikşîne ser hevdîtin û dîyalogê. Pirsgirêkê ku bi mizakereyê were çareserkiririn, li ser bangawaziya Rêber Apo pirsgirêka navxweyî ya li Sûriyê û qebûlkirina pergala Rojava divê bi hevdîtin û dîyalogê were çareserkirin. Lê hemû hevdîtin û dîyalogên ku çêdibin, di piratîkê de pêk nayên û gav nayên avêtin. Lê di dema niha li şûna dîyalog û li hevkirinê li ser tunekirina destkeftiyên Kurdan li Rojava ketine tevgerê. Di 10'ê Adarê de peymanek di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê, Rêveberiya Xweser û hikumeta demkî de hate îmzekirin. Lê di dema niha ew peyman ji aliyê serokê hikumeta demkî Colanî ve hate binpêkirin. Îro tê xuyakirin ku peymanên di asta zagonî de nayên qebûlkirin, ji ber ku hikumeteke demkî ye, dikare di her rojekê de biryarekê bide, zagonan li hember Rojava binpê bike û biguhere."

### 'Rojava nasnameya tevahî gelê Kurd e'

Zubeyda Zumrut axafitina xwe wiha bi dawî kir: "Rewşa ku niha li Rojava tê jiyankirin, xetereyek mizin nîşan dide, em jî ji Ewropa de rewşê dişopînin, saziyên Ewropa û gelê Kurd bi rojane li ser piyanin, derdikevin kolanan, îrişên li ser Rojava û gelê şermezar dikin. Ji ber ku Rojava ji bo tevahî gelê Kurd li çar parçeyê Kurdistanê xeta sor e. Rojava nasnameya tevahî gelê Kurd e, ji bo vê yekê jî gel li kolanan e û ev çalakî jî wê berdewam bikin heya ku ev çete êrişan rawestînin. Em jî weke saziyên Kurdistanî li diyasporan emê dakevin kolanan û li hember vê tundiyê, dengê xwe bilind bikin. Bangawazî tenê ne têrkere, bêdengiya dewletan heye, di piratîkê de tu tişt nayê kirin divê mudexeleyeke lezgîn were kirin. Eger pirsgirêka Kurd neyê çareserkirin, pirsgirêkên li Rojhilatê Navîn jî nayên çareserkirin, çareseriya wê girêdayî Kurda ye. Bangawaziya me ji tevahî cîhanê û ji gelê çar parçeyên Kurdistanê re çawa ku hûn di berxwedaniya Kobanê de bûn yek, dîsa îro jî vê berxwedaniyê ji bo Rojava dûbare bikin. Erdogan got Kobanê ket û wê bikeve, lê tevahî gelê Kurd mudexele kir, dostên Kurdan modexele kirin bi berxwedanek û rêflêksekî bihêz gel daketin qadan. Derdora Kobanê bû xeleka berxwedanê, ev xeleka berxwedanê Kobanê azad kir, îro jî ew deme, eger derdora Rojavayê Kurdistanê hatiye dorpêşkirin, divê ev dorpêça desthilatdaran bi têkoşnê were têkbirin. Em jî bi hêza gelê Kurd bawerin, bi rêxistinkirina gelê Kurd bawerin, ji ber ku ev bi sed sala ye nikarîn îradeya gelê Kurd bişkînin. Gelê Kurd di kolanan de gotin ji mirinê wêdetir tu tişt tune ye ev jî berdêlê wê girane. Em jî divê li destkeftî û berdêlên giran yên ku me dane xwedî derkevin. Rojava ji bo gelê Kurdistanê nirxe, li nasname û îradeya xwe xwedî derbikevin. Li ser vî esasî jî em kar û xwebatê xwe didin meşandin. Bangaweziya me ji her Kurdekî ji 7 salî heya 70'î salî heya ku li dijî êrişên li ser Rojava tê kirin li kolanan bin û berxwedaniya xwe mezin bikin, da ku em dengê xwe bi cîhanê bidin guhdarkirin."

# Rojava bûye kelema projeyên dewletan


**Ronaz Silêman**

**Rojava bûye kelema projeyên dewletan, ji bo wê ew tê armancgirtin, ji dema ragihandina xweseriya Rojava û heya niha ew rastî hemû cuyerên şer û siyasetan tê, li hemberî wê jî berevanî û parastina xakê tê kirin.**

Sedsal gelê Kurd li hemberî tunebûn û qirkirinê, hebûna xwe diparêzin. Ew ji dema avabûna dewletan ve bi ser rêya koçberiyê ne, tişt nema û bi serê wan de nehate kirin. Sedsal in hêzên cîhanî li ser wan bûne yek û li dijî wan şer dikin, di bîr bal û baweriya wan de wê teslîm bibin û wan qir bikin. Lê her şerek destanekê dinivîsîne û ji nû ve berxwedanê vejîn dike. Tevî ku komkujî, talankirin, wêrankirin û ji hev cuda kirin jî, bi ser Kurdan de tê kirin, lê ew bêdeng neman, Kurd ji cîhanê re bûn nimûne û li şûna cîhanê hemû, parastin kir.

Kurd di nava axa xwe de parçe bûn, sînor di navbera wan de hate xêzkirin, navê wan parçeyan guhertine Başûr kirine Îraq, Bakur kirine Tirkiyê, Rojhilat kirine Îran û Rojava jî kirine Sûriyê. Vê yekê jî dilê dijmin û neyaran rehet nekir, ji ber ku hîna navê Kurd û Kurdistan hebû û heye. Ji bo wê êdî li seranserê cîhanê dewletan gelê Kurd dane ber bazara siyaseta xwe. Gelê Kurd jî gelekî ku vê yekê li ser xwe napijirîne, rûmeta xwe û parastina welatê xwe li ser her tiştî digire. Li ser vê bingehê Kurdan bi hezaran ji şehîdan dan û heya roja îro berevaniyê dikin û dibêjin em mirinê qebûl dikin, lê bindestiyê qebûl nakin.

Di roja îro de jî çavê her kesî li cih û warê Kurda ye, wekî ku firehiya dinyayê li ber çavê wan nayê dîtin, lê warên Kurdan tenê li dinyayê heye. Bi taybet xaka Rojavayê Kurdistanê, axa ku bi xwîna şehîdan tê avdan û şîn dibe. Dewletên hegemon her çavên wan li dagirkirin Rojava ye, taybet dewleta Tirk ku rojek nemaye û bi ser Rojava de êriş neaniye. Rojava bûye kelema projeyên dewletan, ji bo wê ew di armancê de ye. Lê li hemberî hemû tiştê ku bi ser mirovahiyê de tê kirin berî ku em bêjin Kurd ji ber ew jî mirov in, berpirsên mirovan bêdeng, ker, kur û lal in li ser hovtiya ku




bi serê wan de tê. Dema em vê dibêjin ne ku em bangê li wan dikin, lê em hevkariya wan a bi xwînrijandina mirovan re ji gelên azadîxwaz û Kurd re diyar dikin. Ji ber ev berpirs her tiştî dibînin û dibhîsin, ji bo wê em ji dîroka mirovên azadîxwaz re dinivîsînin û dibêjin ev jiyana lêgerîna azadiyê ye, ev jiyana birûmet a gelê aştiyê ye. Heyanî dewlet hebin, heyanî berjewendî hebin wê her gelê Kurd û gelê aştîxwaz li seranserî cîhanê di nava jiyana qirkirin de bijîn, lê tu hêz bi îradeya azadiyê nikare. Ev îrade îro li hemû parçeyên Kurdistanê xwe nîşan dide. Ilhama vê îradeyê jî ji xeta têkoşerên azadiya Kurdistanê dest pê kir û heya roja îro berdewam dike. Di ecamê de tekez wekî Kurd hebûna xwe parastiye, wê serkeftiya xwe jî misoger bike.

# ‘Xwedîderketina li Rojava hêzê dide gel û şervanan’

Berdevka Partiya Yekîtiya Demokrat Sema Begdaş tekez kir ku êrîşa li ser Rojava pilaneke navdewletî ya qirkirinê ye û got, “Pêvajoya berî sedsalî ya hêzên hegemon îro tê jiyankirin, xwedîderketina gelê Kurd li Rojava hêzê dide gel û şervanan."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di demeke ku êrîşên çeteyên HTŞ’ê, bêdengiya hêzên navneteweyî û piştgiriya dewleta Tirk a dagirker, li ser Rojava berdewam dikin, hevgirtina gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê li dijî qirkirinê gurtir dibe. Ev êrîş di qonaxeke herî hestiyar a ku Rojhilata Navîn û Sûriyê tê re derbas dibe de pêktên. Derbarê vê mijarê de, berdevka PYD’ê Sema Begdaş ji rojnameya me re axivî.



**‘Pilaneke navdewletî ye’**

Sema Begdaş da zanîn ku êrîşa li ser gelê Kurd herwiha li Rojava pilaneke navdewletî ye û wiha got: “Em dizanin piştî êrîşên ku li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê çêbûn, herwiha berxwedaniya ku li her du taxan hat nîşandan, bi giranî êrîş li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêkhatin. Ev yek di encama pilaneke navdewletî de bû, di vê pilanê de gelek hêz li hev kirin û erê kirin da ku êriş li ser herêmên me çêbibe. Ji destpêka Şoreşa Rojava heya roja îro di milê parastin, diyalog û rêvebirinê de Rêveberiya Xweser xwedî bangewazî û insyatîfê bû. Di her demê de têkoşîna siyasî û diplosaî hatiye kirin, li gel vê yekê jî dema ku êriş hatine kirin gel li ber xwe daye û parastina xwe kiriye. Piştî rûxandina rêjîma Baas gelên Sûriyê projeya Rêveberiya Xweser weke riya çareseriyê ji xwe re didîtin. Herwiha destkeftiyên ku jinê bi dest xistibûn, jinan hem jî hevgirtina gelan weke nimûne û projeyeke demokratîk didîtin. Ji ber vê yekê me dît ku çawa xwestin di serî de vê projeyê têk bibin, îradeya QSD û gelê Kurd vala derxin. Xwestin wê têkoşîn û vîna gelê Kurd a ku li ser asta cîhanê cihê xwe girtibû û nav û dengê xwe dabû tevahiya cîhanê.”

**‘Pêvajoya berî sed salî tê jiyankirin’**

Sema Begdaş diyar kir ku pêvajoya berî sedsalî ya hêzên hegemon îro tê jiyankirin û wiha domand: “Îro herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî êrîşekê tê, di heman demê de Sûriyê û tevahiya Rojhilata Navîn derbasî veguhertinê dibe. Sînorên nû tên avakirin û nexşerê vediguhere, hem jî sîstemên nû di herêmê de çêdibin. Ev pêvajo ne tenê pêvajoya ku di Lozanê de çêbû ku çawa sînorên welatan hatin avakirin û welat hatin parçekirin, herwiha hêzên wê demê ku çawa lihevkirin û peyman di navbera xwe de îmze kirin? Di wê serdemê de wan hêzan berjewendiyê xwe li ser hesabê gelan parastin û desthilatdariya xwe li ser herêman ferzkirin. Piştî sed salî ji wê pêvajoyê îro em heman wê pêvajoyê jiyan dikin. Di her serdemekê de jî tu carî gelê Kurd serê xwe li hemberî tu aliyan danexistiye. Lê belê Kurdan bi dirêjahiya sedê salan li dijî qirkirin, bêedaletî û zordestiyê têkoşîn dane meşandin. Gelê Kurd riya koletiyê nepejirandiye, silogana Kurdan her tim berxwedan bû. Di her şoreşeke Kurdan de teslîmiyet nehatiye qebûlkirin, serkêş û pêşengên gelê Kurd heta dawiyê jî li ber xwe dane piştre neviyên Kurdan riya berxwedaniyê hilbijartine.”

**‘Têkoşîna gel, diplomatîk û siyasî tê domandin’**

Sema destnîşan kir ku têkoşîna gelê Kurd li gel xebata diplomatîk û siyasî ji bo parastina destkekeftiyên Rojava tê domandin û wiha bi lêv kir: “Ji kêliyên yekemîn ên bangewaziya Rêveberiya Xweser û partiyên siyasî ve heya roja îro rihê berxwedaniyê li Rojava û nava gelê Kurd tê dîtin. Gelê Kurd bi zarok, xort, mezin, keç û kalên xwe ve ketin seferberiyê da ku piştevaniya rêveberî û şervanên xwe bikin. Di rewşa heyî de gel ji bo destkeftiyên Şoreşa Rojava berxwedaneke bêhempa dide meşandin, li aliyekî din têkoşîna siyasî û diplomatîk tê domandin. Ev xebat tev têne meşandin da ku Rojava ji komkujiyê rizgar bibe û destkeftiyên salên têkoşîna dirêj werin parastin. Di roja îro de ev berxwedanî li ser asta cîhanê belav bû, ev têkoşîna hundir û tevahiya Kurdistanê hişt aliyên vê pilana qirkirinê pêktînin, xwe vekişînin. Hişt aliyên ku radestkirinê didin pêşiya me ji wê biryarê vegerin.”

**‘Xwedîderketina li Rojava hêzê dide gel û şervanan’**

Sema Begdaş anî ser ziman ku xwedîderketina gelê Kurd li Rojava hêzê dide gel û şervanan û wiha pê de çû: “Em dizanin Rojava parçeyê herî biçûk ji Kurdistanê ye, lê bandora xwe li her çar parçeyan kir, keda gelê Kurd li her sê parçeyan di Şoreşa Rojava de hebû heta ku rabû ser piyan, heya ku mezin û belav bû. Şoreşa ku li Rojava hat lidarxistin bû deriyek ku bi riya wê Kurd li seranserî cîhanê bi têkoşîna xwe hatin naskirin, bi taybet berxwedana gelê Kurd li Kobanê. Îro eger Rojava têkbiçe wê bandora xwe li Başûr, Rojhilat û Bakur bike. Xwedîderketina gelê Kurd li her deverê û piştgiriya wan ji bo Rojava hêzê dide gel û şervanên ku îro li hemberî van êrîşên çeteyan şer dikin. Hevrêziya Kurdî dihêle em bêtir kelecanê werbigirin, hem jî dihêle em li gorî vê hêviyê bin. Serhildana Kurdan li her derê, li aliyekî din name, hevdîtin û danûstandinên ku di navbera hêzên siyasî de hişt ku tevgerk di nav raya giştî û navdewletî de çêbibe.”

**‘Şoreşa Rojava ji bo tevahiya Kurdistanê girîng e’**

Berdevka Partiya Yekîtiya Demokrat Sema Begdaş da tekezkirin ku Şoreşa Rojava ji bo tevahiya gelê Kurd xwedî girîngiyeke mezin e û wiha axivî: “Şoreşa Rojava ji bo her sê parçeyên Kurdistanê girîng e û destkeftiyeke ji bo hemû parçeyan. Di rastiyê de dema ku seferberî hat ragihandin, hem jî fermandarê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî li şûna teslîmiyetê bangewaziya berxwedanê kir, êdî hemû Kurd bi melyonan rabûn ser piyan. Dema ku parçeyek ji Kurdistanê rastî gefan tê, parçeyên din xwedî lê derdikevin. Lê ev cara yekemîne ku em piştgiriyeke bi vî rengî ji gelê Kurd li seranserî Kurdistanê dibînin. Hemû Kurd bi coş û kelecaneke bilind li her derê li ser piyan in, bi şêwazên cuda piştevaniya Rojavayê Kurdistanê dikin. Di vê rewşa heyî de gelê Kurd êdî wê siberoja xwe bi vê berxwedana xwe xêz dike û mafê xwe diparêze.”



## Hêrsa gelê Kurdistanê bilind bûye!

**Ahmet Aktaş**

Li himber van êrîşên mirovkuj û jiyankuj ên bi navê Colanî û serkêşiya wî ya HTŞê tê kirin, gelê Kurdistanê gelek hêrs bûye.
Jixwe heke hêrs nebûya, mirov matmayî dima.
Lê ya giring û pêwîstir ev e: Divê ev hêrsa rast û mafdar, bi hişmendiyek xurt û hoştayiyek piralî werê nirxandin û li ser vê nirxandinê gel, di çarçoveyek niştimanperwerî û mirovperweriyê de were birêxistin kirin.
Ji ber ku yên van komên kujerên mirovahiyê û zîndegehiyê didin bikaranîn û bi taybetî êrîşî ser tevgêr û têkoşîna gelê Kurdistanê dikin, her çendîn bi navê Colanî be jî, lê naxêr ew ne bi tinê ye, hemû kevneperestên hegemonên cîhanê û nokerên wan ên Rojhilata Navîn li pişt van êrîşan e.
Erê ji aliyê leşkerî û hoştaya şer ve, li pêşiyê Dewleta Tirk heye, hema li pey wê ji aliyê finanse kirinê hinek dewletên Ereb ên weke Siûdî û Qeter hene û bê gûman li serê lodê jî dewletên hegemonên cîhanê hene.
Aşkere tê dîtin ku li himberî felsefeyekê û tevgêrekê, koolisyonek navdewletî ya cîhanî heye û ji bo vê hêza ku li dijî sîstema xwe weke kelem û alternatîf dibînin, ji holê rakin an bêbandor bikin bi lez ketine nava hewldanek hevkar.
Gûmana xurt heye ku ji holê rakirinê pirtir, hewl didin lawaz bixin, bê bandor bikin û bixin nava sistema xwe.
Sedemên leza wan jî ev e: Dibînin ku wexta dizaynkirina cîhanê hatiye, lê ger kelemên pêşiya xwe ranekin, wê nakokiyên wan gûrtir bibin û xetera mezin li ser pergala wan a modernîteyê dikeve rojeva cîhanê.
Di sedsala çûyî de li dijî tevgêr û sistemên sosyalist û demokrat, sîstemên alternatif ên mina Koreya Başûr, Vietnama Başûr, Yemen û Irlandaya Başur dan xebitandin.
Wisa diyare, edî ew projeya nabe bersîv, lewma hewl didin ezmûna projeyên nuh ên oldarî mîna Efxanistanê, Sûriyeyê û hwd.saz bikin û bixin rojeva raya giştî.
Bila Tirkiye neyê jibîrkirin ku, 23 sal e bi rêya AKPê, weke parçeyê vê projeyê didin meşandin û diyare dev ji Receb Erdogan bernadin, tew dixwazin wî mîna koordinatorê vê projeyê-sistemê, li van welatan bide xebitandin.
Ji bo di cenga cîhanê ya 3yan de gelek êşê nekişînin, pêdiviyê bi pakijkirina astengên pêş xwe dibînin.
Dibe ku berê, weke xeterek mezin ji xwe re nedidîtin, lê ji bo dema dirêj ne tinê asteng, belê weke pergalek alternatif vê felsefe û birdoziya Apoyî dibînin.
Jixwe berê pirtir di asta nezerî-teorî de bû û ji xwe re xeterek nêz nedidît, lê piştî Şoreşa Rojava kete asta jiyanî-pratik û êdî ji xwe re xeterek nêz û şênber dîtin û lewma berteka tund nîşan didin.
Ne ecêbe ku hêzên weke Colanî yên herî kevneperest û dijwar derxin pêş, jixwe li dijî hêza herî hemdemî û demokrat, encex hêzên herî mirovkuj ên kevneperest karibin hinekî bi kêrî wan werin.
Heke tevgêra gelê Kurdistanê, ji kêmayiyan dersan derxe û karibe ji zemînê erênî yê pêkhatî sûd bigre û yekîtiya netewî damezrêne, ew ê serkeftî be ne neyarên wê û beşer jî wisa tê xwiyakirin.

# Pilana Êrîşa Li Hemberî Kurdan Mezin e!

**Mîrza Ronî**

Bi stratejîya Emerîka projeya Rojhilata Navîn hat guhartin. Li gorî vê guhartinê pergala ku Kurd dixwazin li Surî nayê qebûlkirin. Wê Surî û çeteyên wê li gorî polîtîka Emerîka tev bigerin.
Armanc Kurdistan û Îranê; ji bo ku Emerîka Îranê teslîm bigire, hewcedarî bi çeteyan hebû û piraniya çeteyan li Surî ne, ji bo çeteyan bi kar bîne Emerîka li civîna Parîsê şertê Colanî (Şamê) qebûl kir û pişta xwe da Kurdan. Niha jî çeteyên li Surî kom dike, hemû girtiyên DAIŞ’e ji zîndanan dide berdan û wan dişînin şerê li hemberî Kurdan. Êdî awayekî eşkere wêneyên wan û kirinên wan parve dikin. Armanç ew e ku piştî şerê li hemberî Kurdan wê çeteyên Surî bi piştgiriya dewleta Tirk bişîne şerê li hemberî Îranê.
Politîka Emerîka ya şerê li hemberî Rojhilata Navîn di van çend salên dawî de diyar bûye. Emerîka bi leşkerên xwe tevlî şer nabe, li qadê kî hebe dixwaze wan derxe pêş û bi wan şer bike. Mînaka vê li hemberî şerê Iraqê de jî derket holê û şerê li Afxanistanê de jî heman stratejî meşand. A rast li hemberî rejîma Baas a Esad jî heman gav avêtin. Ji bo ku li qadê berxwedan û şervaniya gelê Kurd hebû neçar ma li pişt Kurdan jî sekinî û wekî hêzên koalîsyonê piştgirî dan Kurdan.
Niha jî armanc piçûkxistina Kurdistanê û dorpêçkirina Îranê ye. Ji bo ku çeteyên Rojhilata Navîn kom bike Emerîka bi piştgiriya dewleta Tirk, Surî û hin dewletên Ereban çeteyan kom dike. Niha li hemberî Kurdan wan bikar tînin û li gorî plan û armanca wan wê Kurdan radestî xwe bike û Kurdistaneke piçûk bi gelê Kurd bide qebûlkirin. Ji bo wê çendê nûnerê Emerîka yê teybet Tom Barrack ji general Mazlum Ebdî dixwest plana Şamê qebûl bike û gavên piçûk ji bo me Kurdan bes didît. Her wiha Tom Barrack biawayekî vekirî anî ziman ku êdî hewce nake hêza QSD’ê li hemberî çeteyan şer bike û digot; QSD’ê ne hewceye.
Li gorî plana wan niha çete dîsa zindî bûn û wan li hemberî Kurdan kar tînin, li gorî armanca wan piştî ku Kurd şikandin û plana Şamê û Tirkiye ser ket wê demê wê çeteyên xwe derbasî çepera Îranê bikin. Lê belê ew dizanin ku gelê Kurd êdî nayê şikandin û li ber xwe dide, ji bo ku li Kobanê ne şikestin û ser ketin. Niha jî ya ku plana wan xera dike berxwedana Kurdan e. Yan wê statûya hebûna Kurdan kebûl bikin yan jî wî biryara şerekî ji şerê niha mezintir li hemberî Kurdan bidin destpê kirin.



# Kurdan bi berxwedaniya xwe destanên lehengiyê nivîsandin (2)

Tevî êrişên giran yên bi balafır, tang, top û çekên giran, li Efrînê gel û şervanan bi îradeya xwe li hember dewleta Tirk û çeteyên wê 58 rojan li ber xwe dan, heman berxwedanî li Şehabyê jî 7 salan dewam kir. Berxwedana Serdemê di rûpelên dîrokî de hat nivîsandin.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Di 18’ê Adara 2018’an ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve piştî berxwedan 58 rojan a gel û şervana bajarê Efrînê hat dagiikirin, lê berxwedanî û sekna gel bû bersîv ji hemû cîhanê re, gelê Efrînê piştî koçberiyê 7 salan li şehbayê li ber xwe dan û bûn mînaka Şerê Gelê Şoreşgerî, mixabin di 1’ê kanûna 2024’an careke din koçberî bû para gelê Efrînê, lê dîsa jî dest ji welatparêzî û berxwedaniyê bernedan.




**Bi 72 balafirên şer êriş kirin**

Di 20’ê çileya 2018’an de, dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê bi pilaneke navneteweyî, bajarê Efrînê ku xwedî cihekî stratîjîk û girîng e di Kurdistanê de, kirin hedef. Şerê Efrînê 58 rojan hat domandin, di roja yekê ji êrîşan, 72 balafirên hêzên dagirker li ser esîmanê Efrînê geriyan û her der bombebaran kirin. Bi êrîşkirina dewleta Tirk her der veguherî kaniya xwîn û komkujiyê. Di van êrîşan de zêdetirî 498 sivîl piraniya wan jin, zarok û kalepîr bûn şehîd bûn û bi sedan kes birîndar bûn, vê yekê jî diyar kir ku dewleta Tirk gelê herêmê hedef digre.
Şervan û gelê Efrînê bi berxwedaneyeke bê hempa li ber xwe dan û derbeyên giran li dagirkeriyê xistin. Ji ber wê berxwedana gel li Efrînê bi navê Berxwdana Serdemê hat binavkirin. Gel û şervanan bi îradeya xwe li hemberî hêza duyem a NATO’yê 58 rojan şer kirin. Efrîna ku serjimariya wê zêdetirî 172 hezar kes pêk tê û weke herêmeke Kurdî resen li Rojavayê Kurdistanê ye. Efrîn jî bi destpêkirina aloziya Sûriyê re serî li hember Rêjîma Sûriyê rakir û di xeta sêyemîn ya Tevgera Azadiya Kurdistanê de; Xweseriya Xwe ya demokratîk îlan kir. Li ser van bingehan bajarê Efrînê li kêlek destkeftî û dewlemendiya xwe ya sererd û binerd bibû herêmeke herî bi ewle û ya pêşesaziyê ji hemû herêmên Sûriyê re.
Di 18’ê Adara 2018’an de Efrîn bi pilaneke navnetewî hate dagirkirin û serweriya xwe tê de îlan kirin. Herêma Efrînê di giştî Sûriyê de yek ji herêmên herî berhemdar yê zeytûn û zeyta zeytûna ye. Ji derveyê wê herêmeke çiyeyî ye û bi ava xwe ya zêde û xwezaya xweşik tê naskirin. Bi derbasbûna dagirkeriyê û komên çeteyan re, li kêlek kiryarên dijmirovî yên ku di derheqê gelê wêyê resen de pêkanîne û hê jî didome, Efrîn ji her alî ve hate talankirin û di asta yekemîn de faşîzma Tirkiyê û komên çeteyan darên wê yên zeytûnan û bi deh hezaran dar, daristan, cihên dîrokî û şûnwarên wê talan kirin.

**Armanca dagirkirina Efrînê têkbirina projeya Neteweya Demokratîk bû**

Gelek niyetên dewleta tirk ji bo dagirkirina Efrînê hebû û rewşa siyasî ya li herêmê. Efrîn di navbera herêmên dagirkirî yên Ezaz û Idlibê de ye û erdnîgeriya wê ji herêmên din cudatir e. Ev jî dihêle dagirkeriya tirk desthiladariya xwe li Sûriyeyê berfireh bike û herêmên ku dagir kirine bigihîjîne hev. Efrîn di projeya Neteweya Demokratîk de, mînaka ewlehî û aştiyê bû. Armanca dewleta tirk ew bû ku vê projeyê têk bibe. Efrîn di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de hebûna xwe di hemû waran de îsbat kir û mînakek zindî ji projeya Neteweya Demokratîk re bû. Di heman demê de hembêza xwe ji hemû koçberên Sûriyeyê re vekir. Gelek proje û planên ku niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên meşandin ji Efrînê dest pê kirin ku yekem car xwendina bi zimanê Kurdî di heman demê de yekem zanîngeh û paymengehên bi Kurdî dîsa li Efrînê dest pê kir û hatin vekirin her wiha gelek proje ji bo pêşketina gel û di xizmeta wê derketin pêş.

**Vekişîna Rûsyayê û bêdengiya qada navneteweyî**

Dema ku êrîş li ser Efrînê pêk hatin bêguman beriya demekê plan der barê wê de bi Rûsyayê re hatin kirin. Rûsyayê beriya êrîşan di hin nûqteyan de li Efrînê cih girtibû. Dema ku komên çekdar ji herêmên Xuta El Şerqiyê bi operasyonê vekişiyan û teslîm bûn her wiha Efrîn teslîmî dagirkeriya Tirkiyetê hat kirin li beramberî Xuta El Şerqiyê û hin herêm ji Idlibê teslîmî rejîma Sûriyeyê bikin ev plan eşkere bû. Êrîşên li ser Efrînê derbeyek ji bo projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bû. Hedef ji êrîşên li ser Efrînê ew bû ku ewlehiya li herêmê têk bibe her wiha ji bo ku bikaribin bi riya Efrînê hin herêmên din jî dagir bikin ev yek jî bi dagirkirina Serêkanî û Girê Spî piştî Efrînê xuya kir.

**Jinên Efrînê bûn sembola berxwedanê**

Beşdarbûna jinan di çalakiyên greva birçîbûnê de li gundên ser sînor bi dirûşm û tilîliyên xwe berxwedan û îradeya wan li dijî dagirkeriya tirk nîşan didan. Dewleta tirk ji ber metirsiyek wê ji îradeya jinan heye lewma her şandeya ku li ser sînor di grava birçîbûnê de bûn rastî êrîşan bi balafirên şer dihatin lê dengê dirûşm û tilîliyên jinan ji dengê êrîşan bilindtir bû. Gelek şandeyên jin ji Filistîn, Lubnan, Bakurê Kurdistanê û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo piştevaniya jinên Efrînê di berxwedana serdemê de bikin berê xwe dan Efrînê. Cîhan tevahî bû şahidê berxwedana jinan di kêliyên Berxwedana Serdemê de. Jinên Efrînê teslîmkarî qebûl nekirin û serî li hemberî dagirkeriyê netewandin, berxwedana wan li Şehbayê jî vê yekê nîşan da. Di heman demê de jinên Efrînê di berxwedanê de bi îsrar in heya rizgarkirina Efrînê ji dagirkeriyê û rengê jin û jiyanê careke din li Efrînê vegerînin.” Piştî komploya cîhanî û bêdengiya tevahî sazî û rêxistinên hiqûqî û nanveteweyî her wiha dorpêça bi sad hezaran ji sivîlan di navenda kantona Efrînê de û berdewamiya êrîşên Tirkiyeyê li ser sivîlan û pêkanîna komkujiyan, di 18’ê Adara 2018’an de gelê herêmê neçarî koçberiyê di riya Cebel El Ehlem a navçeya Şêrewaya Efrînê, bûn û berê xwe dan kantona Şehbayê û li wir pêvajoya duyemîn ji Berxwedana Serdemê ragihandin, heya vê kêliyê di erdnîgariyek nêzî Efrînê de têkoşîna xwe didomînin û dagirkeriya Tirkiyeyê red dikin.

**Berxwedana Serdemê a duyemîn**

Di 18’ê Adara 2018’an de gelê Efrînê piştî berxwedan 58 rojan ji ber êrişên zêde û dorpêçek hovane ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên pê ve girêdayî gelê herêmê neçar man û bi dare zorê ji Efrînê derbikevin. Bi hezaran niştîcehên Kurd ji Efrînê bi darê zorê koçber bûn û berê xwe dan herêma Şehba û Til Rifet. Piştî ku gelê Efrînê koçber bûn û berê xwe dan herêma Şehbayê dest ji pîvana xwe ya şoreşgertî û berxwedaniyê bernedan. Dîsa careke din piştî koçberiyê gelê Efrînê xwe ji nû ve avakirin, saziyên xwe careke din birêxistinkirin û li ser esasê netewa demokratîk a Rêveberiya Xweser kar û xebatê xwe dan meşandin. Gelê Efrînê piştî hemû bûyerên biêş dîsa careke din di riya berxwedaniyê meşiyan. Ruxmî ku ji roja yekemîn a derbasbûna gelê Efrînê ji Şehba re heya derketinê wan êrişên hovane li ser herêmê hebû û bobebarankirin her didomî, lê sekin û israra gelê Efrînê ji hemû êrişan mezintir bû. Herwiha gelê Efrînê di Şehbayê de di nava dorpêçek giran de jiyan dikirin, rêjîma Baas derbaskirina sitûmenî û alavên pêwîst ji bo xwendekar û dibistanan li ser bendên di navbera Heleb û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dikir asteng. Lê belê ev nedibû sedem ku jiyana xwe rawestînin, xwendina xwe bi zimanê dayîkê a kurdî berdewamkirin û nifiş avakirin.
7 sal di Şehbayê de bi alozî û berxwedaniyê derbas bû, hêza gelê Efrînê ji êrişên dagirkeran mezintir bû. Di Şehbayê de ji şerê çekdarî zêderit şerê tayber û derûnî ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên pê ve girêdayî dihat meşandin. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker bi her awayî dixwastin îradeya wî gelî bişkînin û baweriya wan bi şervanan bê bandor bikin, lê her roj şervanan Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) ji gel re isbat dikir ku ew qehremanin û ji bo vî gelî têdikoşin. Gelê Efrînê cara duyem isbat kirin ku sekin û berxwedaniya wan ya qehreman û welatparêziyê ne.

**Careke din koçberî para gelê Efrînê bû**

Ji dema ku şer li gundewarê rojavayê Helebê di sibeha 27’ê Mijdara 2024’an de, piştî êrîşeke hêzên “Heyat Tehrîr el-Şam” li ser hêzên “Artêşa Sûriyeyê” dest pê kir, Milîsên “Artêşa Neteweyî ya Sûriyê”, di bin çavdêriya artêşa Tirk a dagirker de, li herêmên Ezaz, Mare û Babê dest bi seferberiyê kirin da ku operasyoneke leşkerî bi navê Berbanga Azadiyê li dijî herêma Şehba û hin gundên Şêrawa li gundewarê bakurê Helebê bidin destpêkirin ku bi deh hezaran koçberên Efrînê û gelê Şehbayê lê diman. Beriya vê yekê, vekişîna hemû yekîneyên artêşa Rûsî û Sûrî ji herêmê û hemû niştecihên bajarokên Şîe Nibûl û Zehraa pêk hat; Heta ku êrîşên xwe ji sê aliyan ve rojava, bakur û rojhilat di sibeha roja Yekşemê, 1’ê Kanûna Pêşîn a 2024’an de dest pê kirin û heta nîvro ku hêzên Kurd ên herêmî ew paşve kişandin. Heta ku biryara vekişînê û derketina gel ji herêmê hate standin. Ji ber êrişên zêde ê dagirkeran û ji bo parastina sivîlan di 1’ê kanûna 2024’an de biryara vekişînê û derketina gel ji herêmê hate standin. Dîsa û careke din gelê Efrînê ji koçberiyî koçber bûn, tevî ku bi dare zorê gel ji Şehbayê derket ji ber ku gelê Efrînê digotin Şehba ji Efrînê ve nêze bêhna axa Efrînê tê me, em li hêviya vegerê ne em ji vir naçin. Lê mixabin û ji ber êrişên hov dîsa careke din koçber bûn û biryar hat giryin ku berê xwe bidin herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bibin.